K.T.

ENSTÎTUYA ZİMANÊN ZİNDÎ

ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ

ŞAXA MAKEZANISTA ZİMAN Û ÇANDA KURDÎ

TEZA LÎSANSA BİLİND

# Raçavkirina Aliyên Derunî Di Karên Darêjî Di Zimanê Kurdî De

**Azhin jamal Ahmad**

**ŞÊWIRMEND**

**Alk. Doç.Dr. NESIM SÖNMEZ**

**WAN– 2017**

# NAVEROK

**KURTE** .................................................................................................... **i**

**ÖZET** .................................................................................................... **vii**

**ABSTRACT** .................................................................................................... **viii**

**PÊŞGOTIN** .................................................................................................... **x**

**PÊŞKŞKIRN** .................................................................................................... **xi**

**SIPASNAME** .................................................................................................... **xii**

**KURTBEJE** .................................................................................................... **xiii**

**Beşê Yekem**

**Hêma û Lêkdana Watê**

**1.1 DESTPÊK** .................................................................................................... **1**

**1.2 HÊMA Û PEYWENDÎYA WÊ DİNAVBERA FORM ( ŞEKİL ) Û WATEYÊ DE** .................................................................................................... **2**

**1.3 LÊKANA Wateyê** .................................................................................................... **7**

**1.3.1 Rêbaza Hişmendîyê** .................................................................................................... **7**

**1.3.2. Rêbaza Şîrovekirinê** .................................................................................................... **8**

**1.4 WATEYA CİVAKÊ** .................................................................................................... **12**

**1.4.1 Têgehê** .................................................................................................... **12**

**1.4.1.1 ŞêweyêTêgehê** .................................................................................................... **15**

**1.4.1.2 Corên Têgeha** .................................................................................................... **15**

**1.4.1.3 Çêbûna Têgehan ........ 16**

**1.4.1.4 Rêjeya Hestan Di Peyvên Zimanê Kurdî De ........ 20**

**1.4.2 Wateya Bikaranîn û Armancê ........ 22**

**1.4.2.1 Wateya Bikaranînê ........ 22**

**1.4.2.2 Wateya Armancê ........ 27**

**1.4.2.2.1 îdyom ( Biwêj ) ........ 27**

**1.4.2.2.2 Zareva ........ 29**

**Beşa Duwem**

**Alîyê Deronîyê Di Peyvê De**

**2.1. BİNGEHA DERONÎYÊ Dİ PEYVÊ DE ........ 30**

**2.2. ÇAWE BİNGEHA DERONÎYÊ WERDİGİRE ........ 35**

**2.2.1. Dubarebûn ........ 35**

**2.2.2. Ezmun ........ 35**

**2.2.3. Peyva Hevbeş û Firewate ........ 36**

**2.2.4. Goherîna Deng ........ 37**

**2.2.5. Hêz û Awaza Deng ........ 37**

**2.2.6 Navlêkirin ........ 39**

**2.2.7 Derdor ........ 39**

**2.2.8 Rêkxistina Hevokê ........ 40**

**2.2.9 Pêwîstîya Cih û Dem Dinava Du Peyvan De ........ 41**

**2.2.10 Bikaranîna Peyvê ........................................................................................ 41**

**2.2.11 Zivirandin............................................................................................................ 41**

**2.3 ALÎYÊN BİKARANÎNÊ ............................................................................................ 42**

**2.3.1 Ragehandin ............................................................................................................ 42**

**2.3.2 Sîyaset ................................................................................................................... 44**

**2.3.3 Alîyê Wêjeyê .......................................................................................................... 45**

**2.3.34 Şerê Deronî............................................................................................................ 48**

**2.3.5 Alîyên Fêrkirinê ..................................................................................................... 51**

**2.3.6 Ayîn ( Ol ) ............................................................................................................. 51**

**2.4 RÊJEYA WATEYA DERONÎYÊ ............................................................................ 53**

**2.5 ALÎGİR Û BÊ ALÎGİRÎYA PEYVAN ..................................................................... 54**

**2.5.1 Bê Alîgir................................................................................................................. 55**

**2.5.2 Alîgir ...................................................................................................................... 56**

**2.5.2.1 Alîyê Erênî ê Deronîyê.............................................................................................. 56**

**2.2.5.2 Alîyên Nerênî Yên Deronîyê...................................................................................... 57**

**2. 6 RÊJEYA BİKARANÎNÊ.......................................................................................... 57**

**2.6. 1 Çalakî.................................................................................................................... 57**

**2.6.1.1 Corên Peyvên Çalak ............................................................................................. 57**

**2.6.2 Sistî ....................................................................................................................... 58**

**Beşê Sêyem**

**Alîyê Deronîyê Di Peyvên Darêjde**

**3.1 PEYVA DARÊJ** .......... **60**

**3.2 PÊKHATE** .......... **61**

**3.3 Corên Peyvên Darêj Li gorî Beşên Axaftinê** .......... **62**

**3.3.1 Navê Darêj** .......... **62**

**3.3.2 Hevalnavê Darêjî** .......... **65**

**3.3.3 Hevalkarê Darêjî** .......... **67**

**3.3.4 Karê Darêj** .......... **67**

**3. 4 SEDEMÊN BİNGEHA DERONÎYÊ** .......... **71**

**3.5 BANDORA PEYVÊN DARÊJÎ Dİ ÇAVLÊKİRİNA ALÎYÊ DERONÎ DE** .. **74**

**3. 6 BİNGEHA DERONÎYAN** .......... **78**

**3.6.1 Hilkolana Kesî** .......... **78**

**3.6.2 Hilkolîna Civakî** .......... **79**

**3.7 ARMANCA GOTİNÊ** .......... **79**

**3.7.1 Hestên Gotinê** .......... **79**

**3.7.1.1 Hest Gotina Bi Baş** .......... **80**

**3.7.1.2 Hest Gotina Bi Xirabî** .......... **80**

**3.7.2 Hest Rijandin** .......... **80**

**3.7.2.1 Hest Rijandina Ji bo Civakê Bi Sud** .......... **81**

**3.7.2.2 Hest Rijandin Ji bo Sudê Şexsî ( Kesî ) ......................................................... 81**

**3.8 ÇAVLÊKİRİNA ALÎYÊ DERONÎ ...................................................................... 81**

**3.8.1 Bi Başî ........................................................................................................... 81**

**3.8.2 Bi Xirab........................................................................................................... 82**

**ENCAM ........................................................................................................................ 83**

**CAVKANÎ ..................................................................................................................... 84**

## KURTE:


Ev teze behsa wan peyvan dike, xwedîyê bingeha deronîyê di zarevayê ( Kurmancîya Jêrîn ) û zimanê kurdî de. Sedemên çêbûna bingeha deronîyan û bandora wan ( Pêşgir û paşgiran ) di çêbûna bingeha deronîya peyvên darêj de. Banodra karanîna wan di alîyê ( Çavlêkirina peyvên deronî û ayînî, perwerde û wêjeyê ) de.

Ev teze ji sê beşan pêkhatîye.

Beşê Yekem : Behsa ( Hêma û forma wate ) yan dike ku bi hevre wan fikrên li ser lêkdana wateyî eşkere dikin. Her wiha dewrê civakê, destnîşankirina wateya bi armanca gotinê.

Beşê Duwem : Behsa bingeha deronî û peyvan dike. Di alîyê jîyana civaka kurdî rolê wan peyvên bingeha deronîyê heyîn . Di civakê de di dema karanînê de derxistina peyvên alîgir û bê aligir yên darêj.

Beşê Sêyem : Dîyarkirîye ji bo peyvên darêj û pêkhatina bingeha deronî . Eşkerekirina pêşgir û paşgir ku dibe sedemê çêbuna bingea deronîya di peyvên darêj de. Bandora wan laÎyan ku peyvan çêdike û bandora wan di çavlêkieina deronîyê de.

# ÖZET:

Bu tezin bahsettiği konu; Kürtçe dilinin, Soranice lehçesinde bir temele dayanır. Bu temelin konusu; önek ve sonek'lerin, imla sözcüklerine olan etkisidir. Bunların kullanımında olan etkisi; öz, dini, eğitim ve edebi sözcüklerin düşünülmesine neden olmaktadır.

Bu tez, üç bölümden oluşur:

Birinci bölüm: İmge ve anlam formuyla birlikte bahsedilen, anlam ve toplama üzerindeki fikirleri belirtmektedir. Aynı zamanda sözel olarak toplum devirleri ve anlamlarını ifade etmektedir.

İkinci bölüm: Temel sözcüklerden oluşan, Kürt toplumunun yaşayış biçimden, bu sözcüklerin temel anlamlarının rolü vardır. Toplumda kullanılan bu temel ve imgesel sözcüklerin, yandaş ve karşıt sözcüklerin oluşmasını sağlamaktadır.

Üçüncü bölüm de ise: İmge ve temel sözcüklerin belirleyici bir role sahip olmasıdır. İmgesel sözcüklerde, kelimenin kendisi (öz) olmasına neden olan önek ve sonek'lerin belirleyici olması, sözcüklerin oluşmasında etkilidir. Öz sözcüklerin oluşmasındaki etkisini belirtilerini, üçüncü bölümde yer verdik.

## ABSTRACT

This research is discussing about these words which has owner of psychological basics in the dialogue (kurmanji khuro) of Kurdish language. The reasons of making psychological basics and the effects of (prefix& suffix) make psychological basics of complex word, and affect in the field of (media, politics, psychological war, religion, education literature).

This research consists of three parts, the first part discusses (symbol, connection between form and meaning), and all of them explain the ideas of analysis of its giving meaning. Also, the second group, the analysis of meaning according to using and expressing its meaning.

The second part, it is discussing about psychological basics of words. Plus, the role of these words impact upon in the most field of (life, Kurdish society), and there are indications of supreme and the bias of these words in the ratio of using in our society.

The second part, it consists of complex words composing of psychological basics, indication of (prefix& suffix) which is caused to build psychological basics (complex words), refection of these sides making words, and the effects upon regards of psychological basics.

# PÊŞGOTİN

## Navnîşana Tezê:

## Recavkirina aliyên derunî di karê darêjî di zimanên kurdî de

## Rêbaza Tezê:

Di vê tezê de, me kar li ser rêbaza ( Wesif ) kirîye.

## Armanca Tezê:

Armanc ewe ku di zimanê kurdî de eşkerekirina wan peyvên di bingeha deronîyê de heyî ne. Dîyarkirina nirx û bihayê wan di civakê de. Sedemên bingeha deronîyê çêdike dîyar dike û di heman demê de bandora liser alîyên deronîyê de jî dîyar dike.

## Sinorê Tezê:

Teza me behsa bandora alîyên deronîya peyvan, bi giştî darêjan û bi taybet yên di nava civaka kurdî de dike.

## Girîngîya Tezê:

Girîngîya vê tezê ewe ku heya niha di zimanê kurdî de, lêkolînek bivî awayî serbixwe ne hatîye kirin û çêkirin. Her çi qas bingeha deronîyê di roja me ya îro de, girîngîyekî zê de têdayîn jî lê di jîyanê de wekî çiqekî tê bikaranîn. Mînak; ( Ragihandin, şerê deronî, sîyasî, perwerde, ayîn û wêje.....hwkd ) . Her wiha nivîskarên kurd jî girîngîyekî zêde pê nedayîne , kêm behsa wê kirîne. Bi taybetî jî di alîyê zimanvanî de beşên kêm girtîne. Ji ber wê jî lêkolînek bi vî awayî girîngîyek a wê di zimanê kurdî de çêd

## Amêrên Tezê:

Di vê tezê de herî zêde me pişt bi zarê kurmancîya naverast ve girê dayîye.

## Naveroka Tezê:

Ev tez ji bîlî destpêk û encamê ji sê beşan pêkhatîye .

**Beşa Yekem** : Di vî beşî de behsa beşên hêma û peywendîyên di navbera wate û formê de hatîye kirin. Di heman demê de behsa fikrên lêkdana wateyê, wate û civak, beş û corê wê, çawenîya çêbûna wê, rêjeya hestan di peyvên kurdî de, wateya karanîna armancê, îdyom û zareva hatîye kirin.

**Beşa Duwem** : Alîyên peyvan di deronîyê de destnîşan kirîye. Behsa bingeha deronîyê di peyvan de dike . Behsa çawe peyv bingeha deronîyê girtîye dike. Rewşên hatî bi karanînîn evin wekî ; ( sîyasî, şerê deronî, ragihandin, ayîn, fêrkirin û wêje.... ) . Behsa rêjeya alîyên deronî a bê alîgir û alîgir rêjyea karanînê dike.

**Beşê Sêyem :** Ev beş behsa ( alîyên deronîyê di peyvan de dike ). Van babetan jî di nava xwe de digire. Babetên wekî; Peyva darêj, bingeha deronîyê di kolîna civakê û kolandina nava çavkanîyan di gire, Armanca ve gotinê yên wekî hestên rojane hatîn ve gotin, sedemên bingeha deronîyê, bandora peyvên darêj di alîyên deronê de û derketina alîyên deronê di peyvan de bi baş yanjî xirabî**.**

# PÊŞKÊŞÎYA:

_ Pêşkêşîya rêveberê teza min û mamosteyê min ( Birêz Dr Nesîm Sönmez..... ) dikim.

_ Pêşkêşîya hemû endamên xêzana xwe dikim.

## Sipasname :

_ Sipasîya mamoste û rêveberê teza xwe ( Birêz, Dr Nesîm Sönmez ) dikim.Bi dilsozî rêveberîya teza min kir.

_ Sipasîya mamosteyê birêz ( Prf.Dr. Ebdulah Mişrî Dizeyî ) dikim. Alîkarîyekî zêde daye min û bersiva hemû pirsên min daye.

_ Ez sipasîya wan hemû kesan dikim ku bi min re bûne arîkar.

**KURTBÊJE**

**Wer:** Werger

**Weş:**Weşanxane

**Hwd :** Herwekî din

**Hej :** Hejmar

**R:**Rupel

**T:** Tebhe

# Beşê Yekem

# Hêma û Lêkdana Watê

## 1.1 DESTPÊK:

Di vê tezê de lêkolîna li ser çêkirina peyvu peywendîyên di nav wate û formê de hatiye kirin u wate u civak giringîya wate di civak eşkerekirina wan peyvên di bingeha deronîyê de heyî ne. Dîyarkirina nirx û bihayê wan di civakê kurdîde u taybetmendî wan çawaye li her biwarekî jiyanên kurdan

Di her zanîstek bingehekî serekî a biçûk tê hêjmartin. Gelek ji wan zarevayan li ser wê bingehê yekin û peyva biçûktirîn a watedera zimane. Tê dîyarkirin ku çi zimanek bêyî hebûna peyvan nabe. Pêwîstîyeke li cem hemû axaftvanan.

Di gotinê de du alîyên peyvê hene yek denge a din jî wateya wêye. Di vê tezê de bi taybetî behsa wateya peyvê di civaka kurdî de û kurmancîya jêrîn de dike. Her wiha, nirxê wateya peyvê di civakê de û wateya lêkdayî a nava hêmaya ( Watê ) destnîşan dike. Hewildaneke ji bo pênasekirina alîyê deronîya peyvê û peyva darêj de.

Di ziman de bandorekî bi hêz ya peyvê heye. Di nava civakan de ji bo armancên cuda cuda tên bi karanîn. Wateya peyvê jî li gorî wê xwezaya têde bikartê derdikeve. Her kesek di nava civakê de ji bo nîyaz û armanca xwe bi kartîne. Ka ev ji bo vegotina hestan be yan jî ji bo fêmkirina kesê berambe be.

Lêkolînan daye dîyarkirin ku wate du alîyên wê heye. Yek alîyê ( Alwalî ) û alîyê wijdanî. Di gelek peyvan de wateya wijdanî girîngîya wê ji wateya dilalî zêdetire. Çi peyvek jî bêyî alîyê deronî nayê girtin. Hinek sedem hene wisan bi peyvê dike, wateyekî deronî bi bexşîne. Ev wate jî herî zêde bi deronîya kesê karhênerve girêdayîye. Ev jî di alîyê kesê rast ve çêdibe. Helwesta kesê axaftvan derdixe. Yanjî peyvan li gorî wateya xwe bikarnaynin. Belkû wekî ( Xwaze ) bikartînin. Her civakek jî ferhengekî taybet ji wan peyvan heye, ku alîyên deronîya wan heye. Civak rolekî mezin heye di derxistin û çêkirina wateyên cuda yêalîyê erênî û nerênî de. Wan peyvan di hilbijêre ku alîyê erênî û

nerênîya wan heye. Bandorê li ser deronîya gohdarvan jî çêdike. Ev peyv hemû di alîyê jîyanê de rolekî serekî dibînin, bi taybetî di ( Ragehandin, Şerê deronî û Fêrkirina ayînê..... ) de. Di vir de herî zêde giringî bi wan peyvên darêj daye ku ev alîyane tê de derdikevin. Çawe çêbûna wan alîyan wergirtîye. Ew jî ( Pêşgir û Paşgir ) e, ji ber ku rolekî serekî dibîne di alîyê erênî û nerînîya peyvên darêj de.

## 1.2 Hêma û Peywendîya wê Dinavbera Form ( Şekil ) û Wateyê De

Hêma yek ji watedarên zimane, di vegotinê de ji deng û wateyekê pêktê. Du alîyên hêmayê hene, her yek ji wan ya din temam dike. Alîyek forma hêmayê ye,( Vegotin ) yan jî asta gotinê ye. Alîyê din jî ( Naveroka hêma - wate ) yan jî asta naverokê kê ye.

Hêma ji wan tiştên ku mirov li derdora xwe bi xwesteka xwe dixwaze re pêktê. Bi armancekî cuda jî tiştan bi kartîne.(Hisên T. E., Watasazî, 2011, R. 10)

Mirov hêmayê wekî sembolekî bi kartîne. Cudakirina tiştan ji derdore, ew jî lGi ser xwesteka mirovane. Ji bo hêma danîna li ser tiştan mirov bi xwe di nava xwede pêktînin.

Hêma di peyva her zimanekî de beramberî ( Laş, bûyer, kes û tiştan ,di cîhana têbînîyan) de di sekine ji jîhanê derveya piştî ew dîaridên dizivre ku,ber hest dikevin an têbînî kirin (Dizeyî E. M., 2014, R. 74). Ji hemû tiştên li ser rûyê erdê re hêmayek jêre hatîye danîn. Her hêmayek jî beramberî tiştekî di sekine. Hinek ji pisporên hêmanasîye dibêjin : Bi tayber di jîyan mirovan de danîna hêmayan bi giştî û hêmayên zimanî girîngin. Ev jî mirov û gîyandaran ji hevdu cuda dik(Hisên T. E., Watasazî, 2011, R. 10)Di jîyana mirovan a rojane de hêma beşekî herî girînge. Mirov ji bo ji hev fêmkirinê bi kartîne. Ev jî bi hêza bi afrandin û karanînê ve girêdayîye.

Hêma nunerê kes, tişt û bûyerane. Bêyî ku ew tişt di wî demî de amadebe yan jî ne amadebe. Ji ber ku ev jî nunertîya tiştekî dike, ne bi tena serê xwe ye (Dizeyî E. M., 2015, R. 23)Peyv jî wekî ( Hêmayê ) beramberî tiştên madî û manewî di sekine. Ji ber ku hebûna tiştan geleke, lê belê liber çavan ne amadene. Mînak: Peyav ( Biratî, yeksanî, Azadî, Heskirin....hwkd ). Çavkanîya xwe tenê ji hizir û xeyal digire.

Hêma Tişt ( Ten )

Gul → 

Biratî → hebûna wê nîne tenê di hizir û xeyal de heye. (Rawanîye).

Her tişta ku li derdora mivorane xwedîyê navekê ye. Eger hebûna wan heyberî yan jî rawanî be. Ev jî di zivire ser hêza mirovan a ji bo navlêkirinê.

Di nava her civakekê de danîna hêmayan a ji bo her tiştekî cudaye. Ew jî bi tîpa rêketina civakê tê dayîn. Hêmayên zimanî wekî binçîneya zimanî tê danîn. Ji ber ku hêmaya ji derveyî bazneya gelekî çi wateya xwe nîne. Danîna tiştekî wekî ( Gul ) di zimanê kurdî de tenê dengên wekî ( G+u+l ) di rêketina civaka kurdî de ev tişt tê bi karanîn.

Peywendîyekî ( Mantiq, Hişmendî Lojîkî ) dinava hêma û navdêrê de nîne. Di zimanê kurdî de ji bo navdêra peyva ( Dar ) dengê wekî ( D+a+r ) tê bikaranîn. (Ferhadi, 2014, R. 479). Di her formekê de destkarîya dengan dibe sedemê şêwandina dengan. Wekî; (G+ u +l ) ji bo ( L +u + g ) . Dibe sedemê ku mirov ji peyva( Gul ) fêm neke. Ji ber ku wateya peyvan bi rêzgirina tîpan ve girêdayîye. (Dizeyî E. M., 2015, R. 23)Civak wisan li hevkirîye ku dengê peyvekê bi vî awayî rêk bixe. Eger cihê wan hatîbe gohertin wateya wan jî têk diçe. Bihayê wê namîne. Bi têk çûna wateyê re ji xaneya peyvan derdikeve. Ji ber ku pêwîste peyv xwedî wateyekê be da dinava civakê de hebe. Heyîna peyvê yek ji mercên peyvêye.

Tenê heyîna peyvê jî ne bese mînaka dengê ( Meqew ) ji rêze dengekî pêk hatîye. Em dikarin wekî dengekî rêzimanî a peyvê bi pejirînin. Lê belê di civakê de beramberî hêma û tişt na sekine. Di zimanê kurdî de çi wateyekê na bexşîne. Ji bo ku em bi gehin bihayê zimanê peyvê pêwîste, em kar li ser ( Form û Wate ) bikîn. Ji ber ku her hêmayek xwedîyê du alîyane. Her yek ji wan temamkerê a dine.

1- Alîyê şêweyê hêmayê ( Vegotin ) yan jî asta ( Vegotinê ).

2- Alîyê naverokê ( Hêma- Wate ) yan jî asta ( Naverokê ).

( Form ( Şêwe ) û wate ) her du jî hêmayê pêktîne. Peywendîyek bi hê ya wab bi hev re heye. Eger em behsa yek ji wan bikin ya din jî xwe berbi wê ve dikêşîne. Form bi tena serê xwe nirex yê wê nîne. Eger wate jî nebe nirxê wê jî nîne. (Dizeyî E. M., 2015, R. 23)Peywendîya di navbera ( Form û Wateyê ) de du pêşkêşî di nava xwe de digire.

Yekem : Pêşkêşkirinekî xwezayîye , îlham û Eflaton li ser vê heyînê bûn.

Ligorî fikrê Eflaton, ziman li ser herdû rêgezan ( Dal û Medlûl ) sîstemek ya peywendî kirinê ye. Her dujî heyînekî bêjeyî û fîzîkîne, di peywendîyekî raste rast dene (Nawxoş, Zimannasi, 2010, R. 181)Eflaton, dibêjê peywendîya di navbera peyv û wê tiştê de bi awayekî raste raste. Em jî bi  bi bihîstina peyvan re wateya peyvan di zanin.(NerîmanXoşnaw, 2014, R. 64)

Selam Nawxoş û Nerîman Xoşnaw, di pirtûka zimanewanî de  li ser vê rêbazê fikrê xwe anîne ziman. (Nawxoş, Zimanewanî, 2010, R. 182)

1- Ev rêbaz herî zêde li ser bingeha dengê xwezayî eşkere dibe. Wekî; ( Lurey seg ) ( Hêjay tavgay av ) ...hwkd.

2- Eger ev peywendî ya di navbera form û wateyê de raste be, pêwîste heman form ji bo dengê cîhanê jî bê danîn. Lê belê dengên xwezayî jî ji zimanekê ta zimanê din tê gohertin û cîyawaze.

3- Navê taybet jî, biheyîna mercekî pêşwext navek ji bo wê bi kartê. Mînak : ( Befrin ) ji kesekî sor û spî re tê gotin. ( Çavşîn ) ji bo kesên çavşîn tê gotin.

4- Navê wateyî û Efsaneyî, di cîhanê de hebûna wan a fîzîkî tuneye. Ji ber wê jî ev ( Form û Wate ) tenê di hizir û xeyalan de hebûna wan heye.

Em di vir de digehin wê encamê ku di navbera wan de qet peywendîyekî madî rast dîyar nabe.(Xoşnav, Rêbazekanî Ziman, 2016, R. 28) Mînak : Ew peywendîya di navbera ( Agir û Dû ) de bi rêkketinekê çêdibe. Peywendîyekî xwezayî qet di navabera


wan de nîne. Belgeya me a ji bo nebûna vê peywendîyê eve: Me di ziman de hinek peyv hene, du sê wateyan radigehîne. Wekî :

Peyva ( Azar ), tê bi wateya êş û jan, di heman demê de jî tê wateya meha ( Adar ) ê jî.Her wiha peyvên wekî ( Ciwan,şox,rind, xweşik ) hemû li ser yek wateyêne. Eger peywendîyek di navbera wan de hebe, bi rêya tiştên zimane ku hevbeşin ji yek navî derdikeve. (Xoşnav, Rêbazekanî Ziman, 2016, R. 29)Mînak :

Peyva ( Dar ) di zimanê Erebî de ( Şejere ), di zimanê İngîlîzî de ( Tree) ye û di zimanê Farisî de jî ( Arbore ) . Peyv di ziman de li gorî her rewşekê, wateyekê di bexşîne. Bi li hevkirina civakan re jî goherîn bi ser de tê. Peywendîya wan jî ji wir tê, bêyî ku li ser çi cor zagonan bi sekine.

Pêşkêşîya duwem : Li ser ( Li hevkirinê ) çêbûye. Arîsto di wê bawerîyê de bû, li gorî ( Sosêr ) ew peywendîya di navbera form û wateyê de heyî wekî du rêyên dine. Nikarin ji hevvdu cuda bikin. (Dizeyî E. M., 2015, R. 23). Bi cudakirina her yek jiwan re nirxê hêmayê winda dibe. Wisan xuya dike biha û nirxê her yek ji wan bi ya dinve girêdayîye.

Sosêr di pirtûka ( Ilm Elluxe Elam ) de, peywendîya di navbera form û wateyê de bi vî awayî eşkere kirîye. (Sosêr, 1998, R. 133)





Têbînî Sosêr di vir de du tiştên girîng dîyar dike.

**Yekem** : Bihayê zimanê peyvê.

**Duwem** : Pêwîste em balê bikişînin ser du amêran. Ev amêr jî pêktên ji hizir, wêne û bihîstin. Du alîyên peyvê jî hene. Ew jî pêktên ji form û naverokê (Hisên T. E., Watasazî, 2011, R. 16)

Di vê bawerîyê de ye ku ( wate ) berpirse di lêkdana ( Form û hizir ) de. Lê belê (Şekil) dikeve ji derveyî vê peywendîyê. Radigehîne ku qet heyînekî fîzîkî di navbera wan denîne. Hebûna wan tenê di mejîyê axaftvan deye. (Nawxoş, Poxteyek Derbarey Zimannasî, 2008, R. 42).

Di alîyek din de jî ( Ogden û Rîçard ( Richards ) di pirtûkekî bi navê ( Wateya Watê) di sala 1923' an de, peywendîya di nav bera form û wateyê de eşkere dikin. Sê rêgezê cuda ji bo wateyê dîyar kirîne. Li ser sêgoşeya wekî ( Hêma,hizir û şekil ) ku li ser bingeha hişekî dameziran dîne. Bi vî awayî daye eşkerekirin (Humer, 1982, R. 55)




Li gorî vî wêneyî peywendîya di navbera ( Hêma û Şekil ) de, ne raste raste. Peywendîya di navbera ( Hêma û Hizir ) de raste raste.

Form : Zincîrekî dengîye hêmayê çêdike.

Hizir : Fikir û wêne fêmkirina formê ye.

Şekil ( Ten ) : Li tiştên berdest ( heyberî ) yên derdora cîhana rast di gere (Dizeyî E. M., 2015, R. 25)

Bandora Sosêr li ser vê rêbazê dîyare. Dibêje : Peywendîyekî raste rast di nava hêma û şekil de nîne. Peyv jî hinek tiştan destnîşan dike . Ne bixwe Ji alîyê ( Morris ) ve jî ew hizre, ne şekile hêmayê di bexşîne (Nawxoş, Zimannasî, 2010, R. 185)

Olman jî bi heman şêwe fikrek din di derbarê vê peywendîyê de xistîye berçavan. Li gorî wî ( tişt ) belku durbe ji pêkhateya nava peyvan de. Peywendîyek rasterast bi karê watesazîyê ve nîne.Pêwîste bi wateya peyvê re di hizir de kombibe. (Nawxoş, Zimannasî, 2010, R. 185)Hêma û ew tişt û wateyên destnîşankirî peywendîyekî ne raste raste,peywendîya wê bi tiştane re nîne. Tenê wê forma di zimanê mirovan de heyî destnîşan dike. Ev jî ji bo ku tiştan pê berdest bike. Awayê ve gotina civakê çêkirîye, bi reketina civakê re (Ezîz, 2008, R. 42).

Hêma bi biryara civakê re derdikeve holê. Mayîna wê bi mayîna biryarê ve girêdayîye. Qet tiştekî wisan lê nekirîye ku ji zilam re bêje ( Zilam ) ji heyvê re bêje ( Heyîv (Fetah, 2011, R. 47).

## 1.3. LÊKDANA WATEYÊ

### 1-3-1- Rêbaza Hişmendîyê :

Ev rêbaze astek ji asta hêmayê destnîşan dike. Bi rêbaza hizirînê re hatîye nasandin. Destpêka vî fikrî fîlozofê Ingilîz ( Con Lok ) di sedsala 7 an de digire dest.

Navê ne rêbazî (Zihnî ) ji bo rêbazê ragihandîye. Bi karanîna peyvê dibe bandora hizir, hizir jî wateya veşartî a taybet dîyar dike (Humer, 1982, r. 57)Pêwîste wateya peyvan hêmayekî hêmayekî raste rast a hizran be.( Mihemed fehmî Zêdan) di pirtûka ( Fî Felsefe Allxe ) de dibêje : Peyv destnîşa kirina hizire zîhnîye. Ew hizre jî wateya peyvêye (Mihemed, 2015, R. 90).

Bi damezirandina vê rêbazê re bawerî bi aqilê li ser laşre anî. Ziman jî sedemê vegotina wan hizrane. Mirov hiş heye, hizir û hiş kar dike li ser reftarê mirov. (Xoşnav,

Rebazekanî Ziman, 2016, R. 168) . Her wiha li gorî hizirîna vê rêbazê wate ew koma wêneyên hişîne.PeywendÎya wan bi hevre heye. Di rêya peyv yan jî gotinê de kesê axaftvan ji bo kesê gohdar van tê derbas kirin (Islam, 1980, R. 55)

Hêma li gorî vî fikrî di mejî de destnîşanek ya hizrî dike. Ev hizre jî pêktê ji wateya hêmayê. Ji ber ku peyv ne watedare, eger beşek, hizrek û wêneyekê çêneke. Ev beşe jî bi pirojeya têgehiştinê encam dide (Hisên T. E., Watasazî, 2011, R. 33) . Pêwîste her peyvek hizrekî cuda berdest dike. Di destpêkê de heyîna wê di hizir û axaftinê de hebe. Dema dibêje gohdarvan hest bi hebûna wê bike.ku di hizirê gohdarvan hene.

Con Laynz dibêje : Wate îfadekirina hizir û wî beşîye ku bi wê îfadeyê ve girêdayîye. Ew jî di hizrê her kesî deye ku wê ifadeyê dizane (Ebdulcelîl, 2006, R. 181). Di vir de ev fikre zêde misogerîyê li ser wî hizir û fikrî dike. Ev jî di hizra axaftvan û gohdarvan de heye(Humer, 1982, R. 58). Yan jî di xalekî taybet de armanca axaftvan bi kar anîna peyvê ye. Cîyawazîya tiştan ji bo cîyawazîya hizir û axaftvan di zivire. Ji ber wê jî wate di hizir û fikir de tê dîtin. Bi armanca raghiandinê re peywendîya axaftin û gohdarvan têgohertin. Wate navenda teştên hevçeşn nîn(Mihemed, 2015, R. 92)

Di cîhanê de dîyarkirina tiştên cîyawaz ji hizir û fikran çavkanîyê digire. Ev rêbaze di alîyê bingeha fikran de kar dike. Mijara bazneya xwe dîyar dike û hebûna wateyê di hişde destnîşan dike (Mihemed, 2015, R. 90). Di vir de em digehin wê armancê ku binegeha vê rêbazê alîyê rihiyê. Aqil jî di virde hizir, beş û hestan digire(Nawxoş, Zimanewanî, 2010, R. 186).

### 1.3.2 Rêbaza Şîrovekirinê :

Ev rêbaz jî girîngî bi wateya peyvê û bingeha afirandinê dide. ( Kartzo Frod ) şîroveyek berfireh a wateyê di sê pêkhateyan de dîyar dike

1- Şîrovekirina wateya peyvan, bi kêlîya wateyan û peywendîya di navberwateyan deye.Armanca kêlîya wateyan ew komên peyvane ku peywendîya wateyan dinav de heye. Wateya her peyvekê di sîstemê de li gel peyvên din heye.(Nawxoş, Zimannasî, 2010, R. 191). Hebûna xala hevbeş ya dinavbera wateyan de di jêr yek sîstemê de

kom dike. Peyvên wekî : ( Şîn, Kesk,Spî û Zer....hwkd ) Di jêr kêlgeya rengan de hevbeşin. Di pêkhateya wateyan de girîngîyê bi hêvîkirina ferhenga hevbeş dide (Elî M. M., 2010, R. 37)

Ji bo fêmkirina wateya peyvan pêwîste em di destpêkê de van komên peyvan ku peywendîya wan bihevre heye fêm bikin. Di rêya van wateyan re em dikarin wateya wan peyvan bi hurî bizanin.(Xoşnaw N. , 2014, R. 80). Ji ber ku ev koma wateyan jêr kolandina wateyan de her yek dikare ya din destnîşan bike. Armanca serekî şîrovekirina peyvane.Li gorî kêlgeya wateyanhemû ew peyvane taybetmendîyên alîyekî dîyarin . ( (Hisên T. E., Watasazî, 2011, R. 98).


Peywendîya di navbera peyvên wekî ; ( Hevwate, Dijwate û girtin..... hwkd ) Mînak : Gelek caran çend peyvek ji heman wateyê pêktê. ( Ciwan,rind, xweşik ) ji van re tê gotin hev wate.   Eger du peyv du wateyên cuda hebin, wateyên dijwatene.

Mînak : ( Pîs û Paqij ) girtina wan jî peywendîya di navbera du wateyan deye. Bi şêweyekê yek ji ya din berfirehtire, dikare peyva din jî dinava xwe de bigire.


Mînak : ( Firinde Kevok ) .

2- Şîrovekirina peyva ( Hevbêjan ) ji bo pêkhatina peyvên cor bi core.


Gelek peyv di ziman de hene ku, ji wateyekê zêdetir wateyek din digire. Li gorî rewşa bi karanînê derdikeve û wateya wê dizane. Mînak : Peyva ( Azar , heyva adarê ) û wateya êş û janê jî radigihîne.                Azar




3- Şîrovekirina wateya peyvan li ser bingaha sîmayên cudahî: Şîrovekirina wateya peyvan li ser wê sîma û wateyane di hemû zimana de hevbeşe.wateya peyvan Ji komek sîma yên cuda pêktên . her cend semayên zêde bit hejmara takên wan peyvan kêm dibe. (Hisên T. E., Watasazî, 2011, R. 71)mînak (pîyaw) hejmarên takên ji mirovan kêmtire, ji mirov zêdetire, komek ( Sîma, Ru ) yên cuda di nava xwe de digire.





Eger sîmayê peyvê wekî hevbe wê demêdîyardeya hev wateyê derdikeve holê. Hevwate dibin û di sîmayên xwe de hevbeşin.




Her çiqas sîmayên cuda di nava du peyvan de hebe, her du peyv ji hev durdikevin.




Di vê rêyê de şîrovekirina wateya peyvan, alîkare ji bo peyv û hevwateya wan. Cîyawazîya hur ya peyvan jî dîyar dike. Danîna sîmayan jî ne ji xweyîye, belku pêwîstîya wê bi mantiqê peyvane. Sîma jî gelek caran zi zimanek û zimanek din cîyawaz derdikeve. Eger sîmayên wan bi şêweyekî hur neyên destnîşankirin ew bi serkeftî nabe.

## 1.4 WATEYA U CİVAKÊ :

Civak rolekê dibîne di dîyarkirina wateya peyvan de. Ji ber ku wate bi civakê ve girêdayîye. Di destpêkê de mirovan wate ji civakê wergirtîye. Wekî pêwîstîyek a jîyanê bi karanîye. Her kesê di jîyanê de li gorî asta rewşenbîrîya wan wateya peyvan di keve mejîyê wan.

Wateya peyvan jî ji civakekê ta civaka din tê gohertin. Her civakek xwedîyê rêwresmên xwe ne û li gorî wan bi rêve diçe. Carna jî cîyawazîya xelk û çînan dibe sedemê cîyawazîya wateya peyvan. Derdikeve ji wateya xwe a resen jî . (Elwafî, 2000, R. 324).

Çi dema ku şaristanyet pêşbikeve, pêwîstîyên jîyanê gelek bibe û pêşketinên rêbaza deronîyê bi gehinê, wê demê peyv û wateyên nû şêweyên di werdigirin. (Elwafî, 2000, R. 265). Her wiha pey di civakê de dikeve jêr sîstema civakê de. Her core peyvek di vir de bandora sistemên civakî dane ,bi yekgirtina hizir,bawerî û tureya rewşenbîrîyê be heye û dîkar dike. Yan jî ji alîyên gelek endamên civakê ve piştgirîya wê tê kirin.

Lêkdana wateya peyvan, dîyarkirin û rêxistina wateyan di keve sitûyê civakê . Ji ber ku di ferhengê de wateya gelek peyvan dîyar kirîye. Lê belê bi karanîna wê di civakê de wateyk din bi desttêxe. Wate bi şêweyekî giştî ji du beşan pêktê.

### 1.4.1 Têgeh :


Civak li ser vî fikrî rêkketîye. Bi gehiştina encamekê re çêkirîye. Di heman demê de ji bo fêmkirinê u têgehiştin di nava xwe de bikartînin(Dizeyî E. M., 2014, R. 52).


Lêkdana.têgehdi çarçuveya hiş deye. Ewan wêneyên hişî di derbarê tiştan de bi kartîne. têgeh ji wê wateya di nav mejîyê mirovan de pêktê. Em dizanin peywendîyan li gel zimanên din jî werdigire. naveroka hizir digire(Dizeyî E. M., 2014, R. 52).

Eger em balê bidîn ser peyva ( Mêz ) emê bizanin peyva kîjan tiştîye. Ji ber ku em têgeh di zarokatî de fêrî wateyan bûne. Hemî kurd di wateyên fêmdike . Ev fêmkirine wateya mêz û şêweyên têgeh wê dîyar dike. Di derbarê vê de heyîna mêz di hizir û mejî

deye egar di waqih hedi an nedin,hemî peyvan dikarin bi têgah tên binîansandin,mînak(be) egar bi bêjîn têgaha bestin digehînît, ewa Hinek dengên din jî hene vê armancê radigehînin. ( Le, bû ....hwkd ) di vir de bi şêwetêgeh yekî berfirehe. ( (Dizeyî E. M., 2014, R. 58).

têgeh Heyînên wêjeyê dibe du beşên rêketina civakê li ser peywendîya bi hizir fikir kes û civakê ve. Ev jî tevlî hizir hest soz û helwestên civakê bûne ku di ferhena nayên dîtin . Em dikarin bêjin têgeh heyînekî mejîye, rengdana giştî tiştane (Sedîq, 2011, R. 28).Tişt tenha Tiştên madî nagire,an Tiştên ku ji bi hizir an rudawên wekî (mirdin, têgehiştin...........hwkd) jî digre, lê belê her bi peyv tên derbirîn.hinek peyv hen çend têheha li xwe digre mînak






(Sedîq, 2011, R. 32)

Gelek caran jî zarevajî ji peyvekê zêdetir derdikeve. Mînak : Zanîsta ziman, Zimanvanî, Rêziman, Giramatîkî Kar, Kar Firman, Fel.....hwkd (Sedîq, 2011, R. 32)

têheg li gorî miletekê ta miletên din ligorî rêveçûna jîyanê û qonaxa dîrokî tê gohertin. Ji ber ku zareva bi cîyawazîya hizir, fikir û ramanê beramberî jîyan û xwezayê ve girêdayîye. Ji xeyrî vê jî li gorî kesan jî gohertin çêdibe. Hizir û fikrê kesan dinavbera wan de cîyawaze.

têgeh ew fikreye ku ji hizrê mirovan çêdibe. Ev jî dema tu navekî madî û manewî yan jî hizrî û çandî dibihîsî çêdibe (Dizeyî E. M., 2014, R. 52)Hinek caran jî di nava hevde li hevdikin zarevayê hevbeş çêdikin. Ev jî bi taybetî di nava wan welatan de çêdibe, dema li ser yek hizir û yek ayînê be. Lê belê zarevayê her welatekê taybetmendîyên xwe di parêze.

têgeh rêjeya zanyarî û fikrên kesan dîyar dike. Her ev zareva jî kar dike li ser wekhevîya me . Ji ber wê jî ev wekhevî bi başî yan jî xirabî be her bi bandora wê têgehe ku di mejîyê me deye. (Dizeyî E. M., 2015, R. 108)Mînak : Kesek hizir û fikrên wî yên di derbarê xizmatîyê de ne baş be ew kes wekî durparêz derdikeve.

### 1.4.1.1 Şêweyê Têgehê :

( Dr Salim Silêman Alxfaş ), di pirtûka ( Elmhem w Elm Aldlale ) de zareva bi vî awayÎ dabeş kirîye.**1- Têgeha Hestkirinê :** Ev tiştên he li ber hestan dikeve. Mînak : ( Dar,pencere,zevî û.......hwkd ).

**2-Têgeha Nedîyar :** Ew tiştên ji pirtûkên ayînî wergirtîne. Mînak : ( Cin, milyaket, şeytan û hurî...hwkd ).

**3- Têgeha Wateyî :** Ew tişteye ku tenê di hizir û xeyal de heye. Mînak : ( Rastgotin,dadperwerî û .....hwkd ).

**4- Têgeha Efsaneyî :** Hebûna wan tiştan ne dîyare tenê hebûna wan di rastîyê de heye. Mînak : ( Dêw, şev, buka deryayê û.....hwkd )

**5- Têgha Endîşeyî :** Di rastîyê de nîne, lê em hest dikin ku heye. Wekî : ( Kesayetên di nava çîrokê, roman û serpêhatîyan de ).

**6- Têgeha Bercest :** Di rastîya ji derve de hebûna wan heye, lê belê ne dîyarin. Wekî : hesp,dar....hwkd(Elxmaş, 1328, R. 41)

### 1.4.1.2 Corên Têgeha :

1- **Têgeha Giştî** Ev corê zarevaya gelek caran hilgirtina ziman têde hevbeşe. Di çarçuveyek berfireh de ji bo gelek kes û bûyeran di zivire. Siha hest,soz,rewşenbîr digire. Wekî, ( Kevoka spî ) corek ji corên kevokên spîne û xweşike. Her wiha peyva ( Kevoka spî ) hinek hizir û fikrên deronîyê jî di nav xwe de digire. Wekî, ( Nîşana Aşitîyê ).

2- **Têgeha Sinordar :** Ev corê zarevayê jî tayber bi ezmun û zanyarîyên taybet ve girêdayîye. Hêjmarek zêde ya xelkê tê de hevbeş nabin. Wekî, peyva ( Zeyton ) Ew kesnên baxçeyê zeytona heye, wateyek taybet ya xwe ji bo wan heye. Lê belê li cem wan kesên ku baxçeyê zeytona ne be jî çi wateya xwe nîne.

3- **Têgeha Hêzê :** Ji wê wateyê pêktê ku di nava hizir û fikirde, pêwîstî bi hêmayekî dîyar dinava hizir de rakirîye. Wekî beşeke ji sîstema ziman. Ev corê hizran û

wateya veşartî pêwîste li her her cihê derdor amade bibe.(Elxmaş, 1328, R. 42)

4- **Têgeha Locîkî ( Hişî, Mantiqî ) :** Ew wateye ku pêwîstî bi hêmayekî dîyar derdorekî dîyar, dem û cihê dîyarkirî heye. Wekî; ( Mindaleke hat ), di vir de armanca wî dîyare ku zarok kîye.

### 1.4.1.3 Çêbûna Têgehan :

her di destpêka jîyana mirovan û bi hebûna qonaxên civakê re li gel wan bûye. Zareva her ji xêzan û derdor tê girtin. Ji ber wê di peywendîya dinavbera dayîk û bav û endamên xêzanê re çêdibe. Ev jî peywendîyekî xêzanîye, bandorê li ser mirovan dike. Ji bo pêşketina reftar û rêwresman bi bandore. Gelek caran jî kes dest ji wê xwesteka pêwîst berdide. (Dizeyî E. M., 2015, . 108)pitîş ev qonaxên ku têkiliyên civak dibe li şwnên giştîyên u ligel hevalên xwe u kesanên din di encamde hinek reftar tê wergirtin,ev jî dibe zêdebuna têgeha.

Di encama ezmuna bi destketî de, şêweyekî yek bi yek li peyhev peywendîyekê bi karanîna lêkolînê ji lêkolînek taybet ya bi xwe ye. Wekî , ( Nimêj,rojî û zikat...hwkd ) çêdibe. Ev hemû jî bi ser peywendîya civakê de tên. Bi xwe re çend hizir û fikrên nû derdixe holê (Sedîq, 2011, R. 50)

Tê dîyarkirin ku civaka kurd wekî civakên din li gorî qonaxên jîyana xwe, bi pêşketina nirxên rewşenbîrî, buyerên dîrokî û rêwresmên têgeha li cem xwe çêkirine. Goherîn jî bi xweve dîtîne.

Her li pey têgeheka nû bûye. Ji ber ku hêza wê hebû xwestek û aramanca xwe wekî hêmayekî rêkeftinên cîvakî dîyar bike. têgeh li gorî ezmûna hezar salan bi başî û xirabî bi kar anîye. Mînak :

( Baran barîn ) Her çiqas heyînek xwezayîye peywendîya wê bi werzê zivistanê ve heye. Lê belê li gorî toreya kurdî hizir û fikrên din heye. Wekî : ( Xêr û bereket, zorbuna av u jiyanewey dar )



ne barîna baranê jî tê wateya acizbûna xelkê sedemê xirabîya wan, durketina wan ji rêyên ayînî. Tê wateya giranî nemana bereket û rehmê



Yan jî rabûna ( Reşebayê ) jî tê wateya kesek navdar û xwedî desthilatdar mirîye



Ev fikir û hizre di rêjeya jîyanê de di mejîyê kesên kurd de çespayîye. Belku di civakek din de bi wateyek din were. Ji ber ku zareva ji civakekê ta civaka din tê gohertin û fikrên cuda werdigirin.

Mînak : Derbazbûna firinedeyek wekî ( Bumê ) di nava civaka kurd de tê wateya ( Reşbînî ). Çi wextê ku ev firindeye bi ser cihekî yan jî bajar,navçe û gundekê re derbaz bibe, ew cih rastî buyerên mezin û kavilkirinê tê. Lê belê di civaka ingîlîz de jî tê wi wateya ( Geşbînî ) yê.



Di vir de eşkereyeku civaka kurd dibin bandora ayîna îslamê de maye. Desturên vê ayîna ji roja meya îro heya dawîyê di kar û reftarên wan de bandorîya xwe çêkirîye. Di heman demê de bandor li ser têgeh wan jî kirîye. Ji ber ku desturên zimanê ayînî dest bi ser rêwresmên wan de girtîye.

Wateya rêwresmê bandora destorên ayînî di van zagonan de kar di tevgera peywendîya ziman kes û civakê de dike. Her wiha destorek ji bo wan reftar û axaftinên rojane di kêşe.(Salih, 2013, R. 39). Li gel vê jî hinek kes hene van zagonan nifsdikin li gel wan reftaran naguncên. Wekî kesekî bêşerm û bê rêz tê zanîn. Yanî wekî kesekî ji xwedê natirse tê zanîn. Mînak : ( Madeyên hişbir vexwarin, dizîkirin, xomarçî, rêznegirtina dayîk û bav.....hwkd ).

Hinek hizir û fikir peywendî bi zagonên civakê û rêwresmên civakê ve heye. ( Tirs, şerm, pîsî, kofir....hwkd ) dibe gotinên taybet ji bo bi karanînê.Mînak : ( Dema kesek di mire nabe em bêjin kes û karên mirî ew ( Mirîye ) li cihê wê peyvê ( Emrê xwedê kirîye Rehmeta xwedê lêkirîye,Koça dawî kir bi kartîne**.**Ev jî hemû diçin dinava desturên civakê de. Ji civakekê ta civaka din jî tê gohertin. Pêwîste ew kesên ku dinava civakê de dijîn bi wan desturan vegirêdayîbe.(Mihemed B. Z., 2009, R. 12)

Peyva ( Bindîwar ) di alîyê rastî de wateya bin dîware. Lê belê piştî raperînê zarevayek din wergirtîye. Ji bo wan kesan bi kartê di dezgayên hikmetê de qet kar nakin û moçeyan jî werdigirin. Peyava ( Tuz û ba ), wekî heyînekî xwezayîye li cem kesên kurd jî tê wateya tiştên ( Dizî,talankirin ). Ji bilî vê jî hinek peyv li gorî buyerên dîrokî zarevayên cuda werdigirinDi her serdemekê de fikrên nu derdikevin yan jî çêdibin. Mînak : Reng, di civaka kurd de ji kevin heya niha çend fikran di nava xwe de digire. Bi dîroka sîyasî û tureyan re hatîye gohertin.

Rengê Zer.

Li cem Zerdeştîyan wekî pîroze.

Li cem partîyek kurd wekî aligîr radigehîne.

Di tureyên civakê de bi wateya nexweşîya xirap bi kartîne

Rengê Kesk

Li cem partîyek kurd wekî alîgir tê bi karanîn.

Li gorî rêwresmên civakê jî tê bi wateya aramîya asta jîyanê.

Rengê Sor

Li cem partîyekê wateya alîgir radigehîne.

Rengê spî

Nîşana Aşitîyê ye.

Bê alîye.

### 1.4.1.4 Rêjeya Hestan Di Peyvên Zimanê Kurdî De :

Hemû peyvek di rêjeya hestan de ne wekî heve. Rêjeya hestan di hinek peyvan de zêdetire. Di hinek din dejî li gorî rewşa civakê buyerên civakê û rewşenbîrîyê tê gohertin. Zareva jî ji civakekê ta civaka din goherîn tê de tê kirin. Her civakek jî xwedîyên rêwresmên taybetin. (Salih, 2013, R. 38).

Wate Hizir û fikir jî li gorî rêwresmên civakan tê gohertin. Her wiha ew rewşa ku axaftin li ser tê kirin di nava civakê de cudaye. Li gel heman axaftina di rewşek din deye(Salih, 2013, R. 38).

Di rewşên cuda de gotin axatin cîyawazîyê di hestên dîyar de dike. Wekî; peyvên ( Dadperwerî Yekgirtin, sazan, jîrî, aşitî, serbestî û piştgirî....hwkd ).

Ev peyvên me dayîn dîyarkirin rêjya hestên wan di nava civaka kurdî de ji ya civakek din zêdetire. Ji ber ku hestên netewî û niştîmanî li cem kurdan rêjeyekî bilind deye.

Hest heyînekî deronîye di encama karên jîngeyî de çêbûye.

Rêjeya hestan di van peyvan de ne wekheve. Mînak : ( Çekdar, çete, şoreşger, terorîst pêşmerge û caş.....hwkd ) Pêşmerge li cem kurdan şoreşger û xebatkarin. Lê belê

li cem neteweyek din bi navek dine. Yanî terorîst li cem kurdan terorîste, belku li cem neteweyek din xebatkar be.

Peyva ( Enfal ) suretek ya Qurana pîroze. Lê belê li cem kurdan, li gorîkû ew di nava Enfalê de derbaz bûne, dema navê vê peyvê di bihîsîn hestên xirap li cem wan çêdibe. Her wiha ( Helebçe û Emne Soreke ) du navçeyên başûrê Kurdistanê ye. Dema navê van her du navçeyan tê ziman wekî du navçeyên ji alîyê desthilat daran ve hatîye kimyabaran kirin tê bîra mirovan. Hestekî xirap li ser civaka kurd çêkirîye. Gelek buyerên din yên dîrokî jî hene wekîİ; ( Kurew, nugre selman, aşbetal....hwkd ) . Rêjeya hestan di nava van peyvan de zêdetire.

Li piştî raperînê derketina partî û rêxistinên sîyasî gelek peyvên şerê sîyasî bûne hilgirê hêmayên hizbayetîyaher alîyekê. Aaligirên wan wekî remzekî diruşmekî bi kartîne. Mînak : Peyvên wekî; ( Xwendevan, jin, beş, leşker, xwendekar ) li cem desthilatdaran bandorek zêde ya hestan tê de heye. Lê belê li cem xelkên bê alîgir rêjeya hestan kême. Bi heman şêweyî jî peyvên wekî, ( Bindîwar, Şerênavxweyî, gendelî, Şêstû şeş, 31 adarê, tankera neftê, pareyê jêrzemîn û ....hwkd ). Li cem desthilat daran hestên xirap çêdike.

Navên taybet jî hestan di nava xwe de digire. Ev jî li gorî ezmûna şopandina kesan tê gohertin.Eger kesek di dîrokê de karên baş û xirrap kirîbe, ew nave hestên baş radigehîne. Lê belê eger karekî xirap kirîbe ew nave dinava civakê de hestekî xirap werdigire. Mînak: ( Sedam, Iudey, Rxd....hwkd ).

Di civaka kurd de ev nav rêjeya hestên wan zêdetire, ji ya civakek din. Eger dîrok ji yekê hesbike hemû kesek jê hesdike. (Ezîz, 2008, R. 84). Berevajî wê jî eger ji yekê hesneke hemû kes jî jê hesnake. ( Heman çavkanî, 84 ). Gelek caran jî hest ezmuna hizrê çandî yê civakan jî werdigire. Dibe bingeha hestên baş yan jî xirap. Mînak : Peyva ( Pepule, mer, pereselke, dirav û zêr....hwkd ). Li gorî ezmûna jîyanê hestekî baş werdigire. Peyvên wekî; ( Mar,se, beraz,ker û rovî....hwkd ) jî hestên hestên xirap hene.

### 1.4.2 Wateya Bikaranîn û Armancê

#### 1.4.2.1 Wateya Bikaranînê :

Gotina peyvan li gel mirovan di çarçûveyekî sîstemekî taybet de rêkxistîye. Bi şêweyekî rast û guncaw bi kartîne. Bi hizir û fikrên mirovan re ji bo xwesteka xwe ta digehe armancê pîvana werdigire. Eger em peyva bikarhatî lêkbidin wêdemê peyv ne cihgire û di goherînê deye. Ji ber ku kar di wateya peyvên din de dike û beşek ji wan wateyan winda dike û wateyek din pêve girêdide(Dizeyî E. M., 2014, R. 55)

Peyv di her karanînêkê de wateyekî cuda dibexşîne. Ew jî li gorî rewşa karkirin

peyvên din wateyê werdigire.Li gorî ( Firîs û alîgirên wî ), wateya peyvê ji wê pêktê di ziman de bi kartê yan jî ewa ku bi karhatîye. (Elî, Zanistî Ziman u ZimanîKurdî, 2014, R. 82).

Ew rewşa ku peyv tê de têgotin wekî bingeha eşkerekirina peyvê tê danîn.Eger li gel wateyek din bi karbîne wateya peyvê eşkere nabe. Peyvan hêza eşkerekirina wateyan heye (Mihamedîye, 2013, R. 70).

Mînak :

Peyva xirap,

Keçek xirap ⟶ bedrewişt

Katêk xirap ⟶ katek ne guncaw

Newteke xirape ⟶ Madeyên pîs di navdeye.

Pizîşkek xirape ⟶ Jê nizane ne pispore.

Baroduxek xirape ⟶ Nele baru şer û roajawe.

Tendirustîya xirap ⟶ Nexweş.

Peyva ( Xirap ) di her yek ji van bikaranîna de wateyekê dide wateya din.Di her rewşekê de wateyek cuda dibexşîne. Bê goman ev corê rêketinê li ser karanîna hêma û peyvan bi vî awayî dîyar dike. Bi corekê ku wateyekê destnîşan dike. (Hisên .. T., 2011, R. 47)

Di civakê de peyv li gorî desturekî taybet hatîye dîyarkirin û karanîn. Em dikarin bêjin wateya peyvê pêktê ji jimareyek a karanînê û wateyekê ji digire û li gel bikartê. (Klodcrman, 2006, R. 46) Di encama alozîya jîyanê û fêrbûna civakê de gelek peyv hene di alîyên cuda cuda de bikartên. Ji bo her yek ji wan jî wateyek taybet heye. Wateya yek peyva taybet sinordar dike.

Mînak : Peyva ( Reg )    (kok)

Di alîyê pizîşkî  de koka didan radigehîne.

Di alîyê kişt ûkal de koka daran radigehîne.

Di alîyê civakê de jî koka pirsgirêkan radigehîne.

Di alîyê ziman de jî koka karker radigehîne.

Di alîyê hêjmartinê de jî koka jimarê radigehîne.

Peyvê wateyekî piştrast nîne, li gorî cihan tê gohertin.(Layinz, 1968, R. 4) Di her rewşekê de wateyekî cuda çêdike. Li gorî bi karanîna rewşa wateyê eşkere dibe. (Witnîştin ) dibêje : Piştî wateya peyvê , li sedemên bikaranîna wê bigere. (Nasir, 1982, R. 33):.

Hinek peyv hene di zimande hilgirê wateyan vegotin dike. Yek ji wan wateyan qedexeye ev jî wisan kirîye karanînek kêm ya wan di zimanê kurdî de hebe. (Dizeyî E. M., 2014, R. 119)Ji ber ku mirov di alîyê nayet ve bi şêweyekî raste rast di civakê de bikarbîne. Mînak : Peyva ( Ducanî, zarokbûn, komendamzawzê, tewalet....hwkd ). Eger bi karjî bîne peyva wekî ; ( Haşa, hunjî wekî xuşk û birayê minin). li gel bi kartîne.

Nexweşîyên tirsinak di civaka kurd de jiber ( tirs, û rêzgirtina kesên nexweş yan jî ji bo tenêbûnê ) bikartîne. Hestên nexweş wekî peyva ( Mulêhatin ) nê ye. Ji bo bîrnên pîs jî peyva derdwerî ji bo nexweşîya ( Penceşêrê) ye.

Peyvên (tapokirî yên) kurdan wisan kirîye ku bi zanayî li gel peyvên din asan be. Ew jî bûye sedem ku peyvên din yên asayî di karanînê de têkbiçe.

Zê ; du wateyên wê heye.

Zê ( 1) Rubarê mezin ( Wateya asayî ).

Zê (2 ) Endamê laşê kesê mêye ( wateya qedexeye) (Dizeyî E. M., 2014, R. 119)

Bandora rewşa axaftvan li ser karanîna peyva hevwate heye. Peyva wekî ; ( Nezan), di ferhenga ziman de bi wateya ( Gêj, bê mejî û hir.... hwkd ) tê. Bi karanîna van peyvan re pile û bandora kesayetîya rewşenbîr dîyar dibe. Her wiha peyva ( Xwedîyê xwestekên taybet, siqet kulek, bê keyf, xemdar û xembar) .Ji bilî vê jî bandora bawerîya hinek alîgiran jî li ser bikaranîna hinek peyvan heye. Mînak :

| | |
|---|---|
| Xwendevan | Qutabî |
| Liq | Melbend |
| Supa | Leşker |
| Jin | Afret |
| Gencan | Lawan |

Ev peyv hemû yek çavkanîyê destnîşan dikin. Lê belê gotin û bi karanîna wan her yek ji hest û helwestên cîyawazin Hemû wextan wateya temam nabe peyvek di karanîna wateyê de. Ev jî ji bo wê dîyar dike tureya civakê li ser hev wate bûna peyvan desturê nade di cihê hevde karbên. Ji ber ku di karanînê de her yekê çarçûveyek taybet a xwe heye.

Mînak : Peyva ( Ciwan ) , ( Qoz ) her du jî bi wateya xweşikbûnê tên. Lê belê di karanînê de cîyawaze. Ji ber ku ( Ciwan ) ji bo keç bi kar tê û ( Qoz ) jî ji bo kur bi kartê. Na be em bêjin ( Kurek ciwan ) di civakê de ne xweşike. Pêwîste em bêjin ( Kurek Qoz). Bi heman awayî dema em bêjin ( Keçek Qoz ) dîsan wekî gotinek ne dicih de tê. Pêwîste em bêjin ( Keçek ciwan ). Di dema peyv gotinê de pêwîste em agahdarê tureya civakê bin. Civak karanîna peyvê dîyar dike.

Yan jî di tirsa çavker û hesud de peyva berevajî bi kartîne. Ji başîyê re dibêjin xirap. Ji ciwan re dibêjin ne xweşik û ji zîrek re jî dibêjin tembel (Dizeyî E. M., 2014, R. 200). Firewate û hevbêj di zimanê kurdî de heya radeyekê berçavan dikevin. Ev jî dibe sedemê çêbûna ( Lêlî ). Lê belê di karanîna civakê de ev lêle namîne. Wateya wê dizane û dibêje:Peyv heya demekî wateya ( Lêlî, xemamî ) bi xwe ve digire. Dema bi kartîne wateya wê derdikeve (Humer, 1982, R. 68).

Mînak :

hevbêjî

1 şax        2  çîya

Şax (2 ) şaxê bizina        (Ocek, 2014, R. 51)

( Firewate )

Roj ( 2 ) xor                    (Dizeyî E. M., 2009, R. 89)

Roj (2) rojên heftîy

Her peyva ku ji devê axaftvan derdikeve, xwedî armancekê ye. Di her rewşekî cîyawaz de peyv armancê cuda cuda di nava xwe de digire. Ev gotine jî di wateyek cuda a ferhengê de dibêje. Gotina wê jî gelek caran bi veşartî dibêje. Sedemê vê peşkêşkirina veşartî jî dizivire ser çend aramnc û sedeman.

Desturên ziman ne tenê şerte bi gehe wateya peyvê. Ji ber gelek caran mirov di dema axaftina rojanede çend cor û şêwazên gotinên cuda cuda bi armanca derdora xwe re dibêje. Di vir de jî pêwîstî bi civak û bi destxistina armancê heye.

Wateyek xwedî armanc pêktê ji wan gotinên derdor ku wateyekê dide wateya derdor (Elî, Zanistî Ziman u Zimanî Kurdî, 2014, R. 228).Mînak : wekî ( ziman dirêj, dest kurt, rû reş û destpîs.....hwkd ). Ev watene wateya ferhengî na girin wateyek din li pişt wan deye. Ji bo heste, helwestek û barek deronî tê gotin. Bi wateya tomarkera wateya serekî dijmêre. Di derdora ziman de armancek din kar dike.Lê belê peywendîya wan bi hevre heye (Elî, Zanistî Ziman u Zimanî Kurdî, 2014, R. 228)

Ev wateјî ji civakek ta civaka din tê gohertin. Xasyet û taybetmendîyên taybet yên xwe heye. Bende bi rêwresmê civakê ve. Di keve jêr bandora wê civaka xwezayî ku tê de bikartê (Elî, Zanistî Ziman u Zimanî Kurdî, 2014, R. 228). Ji ber wê axaftvanê her civakekê di demê karanîna peyvekê de pêwîste, pisporê zanyarîyê derdor û rêwresmên axaftinê be. Ji hemû destur ûzagonên di nava civakê de agahdar be.

Mînak ( Omer ) ne taybete rêgeza nêr bikartîne,taybete bi navê kesekê ve. Lê melê dema ji bo kesek din hat gotin wê demê wateya kesekî( jan û tirs) radigehîne. Peyva ( Pero) ji bilî wekî parçeyek qumaşe tê danîn, gelek caran heye ji bo mirovê sivik jî tê bi karanîn. Eger tu bixwazî qumaşçî sivik bikî tu wê navê perok lê bikî (Sedîq, 2011, R. 35) . Jiber wê jî em dibînin firewateyaher gotinekê li ser wê di sekine ku axafvan di xwaze bi gehîne gohdarvan (Elî, Zanistî Ziman u ZimaNî Kurdî, 2014, R. 227).

Mînak : Peyva ( Ker ) û ( Nabihîse ) her du jî xwedîyê yek wateyên ne. Lê belê bi karanîna her yek ji wan jî aramncek li pişt wane. Eger peyvan ( ker ) bi karanî armanca wî sivik kirine. Lê belê ger peyva ( nabihîse ) bi karanî ew armanca rêzgirtinê ye. Peyva ku dur parêz be nikare wateya xwe bide bi vê re jî wateya ferhengî ya wê vekirî dimîne ji bo her lêkdanekê. Lê belê di dema karanînê de hinek wateyan winda dike û nêzîkî wateya armanca xwe dibe.

Gotina peyva fire wate li ser armanca kesê axaftvan di sekine. Çi armancek ya wî hebe peyvekê hildibijêre. Gelek peyv hene di dema gotinê de tirs û dillerizînê çêdike li

ser gohdarvan. Mînak : ( Ezmun, yanjî yazilîn) Dema ku xwendevan dibihîse hest bi tirs û diltengîyê dike.Peyva ( Helsegandin ) jî heman wateyê radigehîne lê belê di alîyê deronîyê de bandorek xirap nîne wekî di şêweyên din de. Di vir de hinek ji wateyan wateyê dide armancê dîyarkirî di karanînê de emê eşkere bikîn.

### 1.4.2.2 Wateya armancê

#### 1.4.2.2.1 Îdyom ( Biwêj )

îdyom ew peyvên ku di nava civakê de dema tên gotin armancek din li pişt xwe de dihêle. Hizrek, hestek û armancek taybet dizivirîne û dibêje. Binçîna wêjî li ser şibandina hêmayê ye (Elî C. M., 1982, R. 16)

îdyom wekî peyamek armancekê di dema pêwîste bi kartê. Gelek caran hest û soz wisan dike wateya ferhengî ji bo wateyek din bikarbîne. Bi wateyek din bi wateya armancê re çêdibe(Sebrî, 2014, R. 91)

Îdyom ji wateya ferhengîya xwe wateyekî cîyawaze. Bi awayekî ne raste rast armancê pêktîne. Em dikarin bêjin îdyom ji wê tevlîhevîya asayî du peyv yan jî zêdetir pêktê. Di encama wê tevlîhevîyê de wateya ku derdikeve kertîye. Yanjî wateya rêzimanî ya van peyvan pêşbînî nakin. (Fetah P. D., 2010, . 167). Mînak : ( Dil req ) ji du peyvan ( Dil) û ( req ) pêktê. Belku di wateyê de armancê wê kesekî pîs û bê rehme.

Peyva ( Dev şirîn) , ji peyva ( Dev) û ( Şirîn ) pêkhatîye. Belku armanca wê gotinê xweş, nerm û xweşikin.Her îdyomek xwedîyê armancekî taybete. Lêkdana wateyan di wateya pêkhêner de cîyawaze. Bi wê wateyê nikare di beşê pêkhêra wateyê de bi destbixe. Pêwîste ji bo civak û tureya wê bizivire. Ji ber ku çêbûna wê ji nava cigera civakê de derketîye.Nasnameya milet jî wergirtîye û taybetmendîyên civakê jî li ser dîyare. Wekî formekê dikare li ser taybetmendîyên mirov, civak û grupekê be. ( (Mehwî, 2009, R. 168) .

Ew taybetmendîye jî dibe xalekî ya cudakirina di nava civak , grup û çînan de. Eger em dinava civakekê de nejîn em reftarên wan nizanin. Ji ber ku îdyom di kurîya

deye û ji wir jî çêbûye. Eger em bi ser yek netew û gelekê jî bin. Hinek caran buyer û serpêhatîyên çînan yan jî grupekê, Mînak : ( Xwîna sîyahweş ) ji bo axaftvan karek û aşûbeyek dirêj bike. ( Ferhakkuj ) yek ji fitneçî û ziman baz be. ( (Elî C. M., 1982, R. 25). ( xiweneke lale serhe ) ji bo karek yan serpêhatîyekî dirêj bikêşe û nebire.

Civak rolekî girîng di eşkerekirina wateya îdyom û karanîna armancê de dibîne. Her axaftvanekî kurd dema kertek ya peyvê dibihîse dikare kerta din jî temam bike. Mînak : ( Milî şikand ) yan jî ( çawbestîlêkir ). (Feteh P. D., 2010, R. 17).

Şerteku peyv bi Îdyomê hebûna wate û armancekî dîyar di derbarê tiştek yan kesekî bi başî û xirabî nîşa bike. Yan jî wateyek kurbe û pêwîstî bi şîrovekirinê hebe. (Elî C. M., 1982, R. 24).

Eger armancek di pişt peyvan de hebe nabe îdyom.

1- Ji mirovên du ziman hesnake. ( Fitne )

2- Du ziman dizane.(Feteh P. D., 2010, R. 168).

Di hevoka yekem de peyva ( Du ziman ) Îdyome. Ji ber ku armanca wê ne duzimane, armanc kesekî( fitneçîye), gotinan dibe û tîne.

Di hevoka duwem de jî du ziman ne îdyome. Ji ber ku çi armancekê ranagihîne, tenê hevokek asayî û eşkereye. Pêwîstîya wê bi eşkerekirin û lêkdanekî zêde nîne. îdyomê hemû alîyên civaka kurd girtîye. Di her alîyekê de çendîn îdyom çêbûne. Her wiha ( Hizir, bawerîyên ayînî, efsane, rêwresmên civakî, çend endamên laşê mirovan û navê gîyandaran....hwkd ) bûyîne çavkanîya çêbûna îdyoman.

( Şêrê Rustemê Zale ) ji efsaneyê girtîye.

( Dilê wî reşe ), kesê ku rik û kîna wî gelek be.(Elî F. M., 1998, R. 71)

( Kuneba ), ji bo kesekî direwker dibêje.

( Gaybinîye ), gelek reqe kur û lame.

( Gozan dijmêre ), gêje ji tiştekî fêmnake.

( Cerg sutawe ), zarogê wî mirîye.

Her îdyomekê di alîyekê de çavkanîyek girtîye, dikare di her alîyekê de jî bikar bîne.

### 1.4.2.2.2 Zarave:

Corek ji corên peyvane, ziman bi hevre datîne. Peyvekî taybete grupên pispor di alîyên dîyar de sazdike. Ji bo karek û armancekî taybet di wî alîde bikartîne. (Elî T. H., Zanisti Ziman u Zimani Kurdi, 2014, R. 306). Her alîyek xwedîyê zarevayekî taybete. Pisporên wî alî ew zareva destnîşan kirîne.

Di ziman de du cor zareva heye. Yek giştîye ya din jî taybete bi polekî di nava zarevayê giştî de çêbûyî. Dibib beşek ji giştîyan. Mînak : Gul ( Keske, Beybûne, Nêrgize...hwkd )

Gul zarevayekî giştîye. Taybetmendîyên wê jî endamên wê gulêne, peywendîya wateya wan peyvane. Ji taybet jî ji bo giştî ji hevwateye, ji giştî jî ji bo taybet dij wateye (Dizeyî E. M., 2014, R. 139). Di karanînê de dikare armanca giştî bi razîne. Ji ber ku hevwatene. Mînak : ( Nêrgizekim çand ) armanca wê min( gulek çand), lê belê eger bêje min ( Gulek çand ) armanca wê ne ewe ku (nêrgiz çand ). Ji ber ku gul zarevayekîgiştîye, çend gulên di nava xwe de digire. Nizane armanc kîjan gule. têgehtaybet di karanînê de armanca wê dîyare. Lê belê zarevayê giştî di karanînê de armanca wê nedîyare. Wateya giştî wateya taybet vedişêre. Yan jî bi wateyek din a taybet re diçe nava wateya giştî. (Muîn, 2005, R. 22).

Wateya zareva wateykî hur û taybete. Li gorî tureya çanda civakan tê gohertin. Di karanînê de armancên cîyawaz dîyar dike. Wekî : Peyva ( Petate ), di zimanê İngilîzî de li ser pola ( Zebzeyane ) lê belê di zimanê kurdî de ne bi ser pola ( Meyve û zebzeya ) ne. Pêwîste di karanîna peyvan de em agahdarê zareva bibîn.

Hinek zareva taybetib bi çînekê ve û hinek jî bi dest çîna din nakevin. Mînak; ( Şîr der ) tenê ji alîyê xwendevan û bîyolîjî nasan ve bikartê. Ne şerte ku di hemû deman de zarevayê taybet di berjeng û edgaran de nêzîkî hevbe. Carna jî zarevayê dijyek li jêr zarevayê giştî de kom dibe.Mînak : ( Kirin û firotin ), du zarevayên taybetin û dijî hevin. Lê belê ser bi yek grupêne. Mînak : ( Zarevayê peydakirin (Dizeyî E. M., 2014, R. 140). Yan jî zarevayê ( sewdakirin ) bi kartîne(Hisên T. E., Watasazî, 2011, R. 9

**Beşaduwem**

**Alîyê deronîyê di peyvê de**

## 2.1 BİNGEHA DERONÎYÊ Dİ PEYVÊ DE

Ji alîyên kesên civakê ve gotina peyvan, cîyawazîyek gelek heye di barmberî bûyer, tişt û têgeh de.

(Ogdn û Rîçards) dibêje : Ev gotina kesek bi kartîne hilgirê wateyekî takekesî a dîyarkirîye. Cîyawazîya wateyê jî heye li gel kesek din. Ji ber ku bandora rewşa xwe ye ne ya kesek dine.(Dizeyî E. M., Zimanewani Deruni, 2014, R. 37)

Gotin, wateyekê di rewşa kesan dike. Çawe hest pê dike wisan jî Îfade dike. Alîyê deronî ew alîye ku asta watayekî hest, soz hizir û ramanê axaftvan îfade dike. Ev jî di çarçuveya derdorekî dîyar de. ((Emîn, 2009, R. 128).

Mînak :

Şirîn lerzuke.

Şirîn dilerize.

Di vir de wateya her du alîyan berjengê lerzîn û lerzok bi xwe ve girê dide. Di hevoka yekem de sivik girtin û çavekî kêm temaşekirin pêve dîyare. Di hevoka duwem de ev wateye pêve ne dîyare.

Bingeha deronîya wan wateyan digire, Wateyekî deronî pêwîstî bi axaftinan ne. Wekî : Pîyaw + Azayetî + Rastgoyî....hwkd (Dizeyî E. M., Zimanewanî Derunî, 2014, R. 38).

Eşkereye ku ev bingeh jî li gorî asta hizrê kes , hest, soz û axatvan tê gohertin. Ji ber ku mirov berbi dariştinên cor bi cor a peyvê ji bo gotinan diçe. Her peyvek wateyekê di rewşa kesan de dike. Çawe hest pê bike bi wî awayî jî dibêje.

Hest û soz jî ji morvekî ta mirovê din tê gohertin. Li gorî kes û civakê goherîn bi serda tê. Ev jî wisan dike wateya peyvê sinordar be. Peyv li gor wateya deronîyê cîyawazin, bi wateya hinek tişt,kes û bûyer....hwkd dilxweş dibin. Bi hinek din jî ne aram û dil teng dibin.Ev wata ne jî hemû bi ezmuna kesan ve girêdayîye. (Dizeyî E. M., Zimanewanî Derunî, 2014, R. 38)Mînak : Mirov dema peyvên wekî : ( Şer, ajawe, teqîn û mirin....hwkd ), dibihîse rastî dil tengîyê tê. Dema peyvên wekî ( Spî, roj û deryayê ) jî dibîhîse hest bi aramî û xweşîyê dike.

Peyv ji bilî erkê rêzimanî bingeha deronîyê jî heye. Di zimanê kurdî de jî heyîn ne bêbeşin. Hejmarekî peyvan di gelek beşên axaftinê de hilgirê wan bingehê deronîyê ne. Di vir de jî emê ki gorî pêkhateya peyvê eşkere bikîn.

**a- Peyva Sade :** Ev peyve ji mirovekî serbixwe û wate dar pêktê. Bêyî ku zêde peyva darijtî werbigire. Wekî: ( Asin, gul û hêz....hwkd), (Şiwanî, 2014, R. 188).

Gelek peyvên di nava ( Nav, hevalnav, cînav, û hevalkar....hwkd ) de bingeha deronîyê heye. Mînak : Ew wateyên êş, azar û meynet, li paşîyêne bandorek xirap ya wan heye. Wekî ; ( Xem, êş, şer,ceng, merg û hêz....hwkd ) corek yê reftaran di nav wan deye. Hinek peyvên din hene wekî ( Welat, xak, pare, mizgeft....hwkd ) alîyên gehiştinê nîşan didin. Ji ber wê jî bandorek baş ya wan heye. Navên wan gîyandarên wateya dirinde, pîs û fêlbazîyê didin evin. ( se, hirç, beraz, gorî, rovî û ker....hwkd ) bandorek xirap ya wan heye.

Beşek ji rengan jî bandorek ya wan a baş û xirap li ser civaka kurdî heye. Ew jî li gorî serdeman hizir, bawerîya ayînî û sîyasetê bingeha deronîyê werdigire. Rengên wekî ( Spî û kes ), bandorek baş ya wan heye ji ber ku ( spî ) bi wateya aşitî, paqijî, bi hevre jîyankirin û bê alîgirê tê. ( Kesk ) jî bi wateya jîyana aram tê. Ev hest bûne binçîneya bingeha deronî

Ji bilî vê jî ( Reş û Sor ), hestên xirap radigehîne. Ji ber ku rengê ( Reş ) wateya nexweşî û tazîyan tê. ( Sor ) jÎ nîşana xwîn rêjîn û tirsê ye.

Rengê ( Zer ) jî bingeha ya wê a başî û xirabîyê heye. Li gorî hizir, bawerî û rêwresman bi  bandore. Di alîyê Zerdeştîyan de bingehek baş heye. Li cem partîyek a Kurdistanê wateya alîgiran tê. Bi heman şêweyî bandorek a başîyê radigehîne.

Mirov herî zêde hestên xwe bi hevalnavan îfade dike. Wesfa kes, bûyer û tiştan pê dike. Axaftvan jî hestên xwe bi rîya van hevalnavan re îfade dike. Wekî : ( Baş, paqij,xweş û şirîn....hwkd ). Ev hevalnava ne hestan baş û ciwan dike. Bandorek baş ya wan heye. Ewên wekî; ( Xirap, pîs, bed....hwkd ) bandorek xirap ya wan heye û bandorekî bi hêz jî li ser axaftvan dike.

Hevalkar jî bi tiştekdin axaftinê temam dike û wesfa karekî dike. Yan jî ruyek yê karan derdixe holê. Bingeha deronîyê jî werdigire. Mînak :  Hevalkar ( Tund, gunc , xêra û hwkd ). Her wiha jimare jî li gorî tureya civakê bingeha deronîyê werdigire. Jimara ( yek ) di pêkhatina xwe de jimareyekî sadeye.

Di alîyê wateya xwe de jî di îslamê de bi berjenga Yezdan tê zanîn. Ev jî bûye sedemê ku nirxekî biha bi vê jimarê bê dayîn. Her wiha beşdarîyê di hinek peyvên pesend de dike. Wekî ( Yekbûn, Yekgotin, Yekrêbaz û....hwkd ). Her wiha jimara ( Du ) jî heya demekê bandorek xirap heye. Ji ber ku beşdarîya hinek peyvên ne sade dike. Mînak : ( Du ziman, du ru, du çav û du alî....hwkd (Dizeyî E. M., Watay Karîgeriî Le Biwar Ragahandin, 2004, R. 50)

Karên wekî ( Kuştin, şewitîn, girtin û mirin....hwkd ), dema mirov van peyvan di bihîse hestên xirap di mirovan de çêdike. Bingehekî xirap werdigire.

Beşek ji amarazan jî hilgirê bingeha deronîyê ye. Bi taybetî ew amrazên hest û soza axaftvan werdigire. Di dema gotina wan amrazan de gelek balkêşin. Mînak : ( Ax, ox....hwkd ). Mirov dema van hestan jî dibîhîse hestên xirap çêdibe. ( Hey, huya....hwkd), gotina van peyvan ji bo aramanca sivikatî henekkirinê ye. Evan peyvan jî bingehek xirap heye. Amrazên wekî ( Oxey, eha û ela ....hwkd ) , di demên xweşîyê de ji bo armanca balkêşînê bi kartê. Ev peyv jî hestek baş çêdike.

**b- Peyva Darêj :** Peyvekî sadeye, ji pêşgir û paşgir yan jî ji herduyan pêktê. Hinek peyvên darêj jî bingehek ya wan a deronîyê heye. Mînak ; ( Nav, hevalnav û hevalkar....hwkd) .Heval navjî beşek girîng a bingeha deronîyê heye. Hestên axaftvan beramberî buyer, tişt û kesan dîyar dike.

Mînak : ( Ne paqij, nerast, nexweş, nezan, nesaz, bê mirad, ne zilam, şerker û bêxîret......hwkd )Her yek ji van peyvan bingehek xirap ya mirovan dîyar dike. Bi bihîstîna van peyvan re hestên xirap çêdibe. Banadorekî li ser deronîya mirovan dike û dicihde dihêle. Ji ber ku bingehekî deronîya xirap wergirtîye. Berevajî wê peyvên wekî; ( Rêzdar, birêz, nazdar, bi xîret,jêzan û xak....hwkd ). bandorek baş ya wan heye li ser gohdarvan û bingehekî baş jî wergirtîne.

Navên darêj jî dibin çend corek, her corek ji van jî jibo armancekî dîyar bikartên. Li gorî bi karanîna wan bingeha deronîyê werdigire. Mînak :

Navên biçûkkirinê jî ji bo heskirin û sivikkirina kesê beramber bi kartê. Ev jî dibe sedemê ku bingehek xirap ya wê hebe. Mînak : ( Kîjole, nese, bile, kurujke û maluçke....hwkd ) . Ew wateyên ku navên pişeyê radigehînin wekî; ( Aşewan, tewinker, xizmetkar, karker, çayçî, nalebend, derketwan û kotirbaz....hwkd ) . Bingehek xirap ya van peyvan jî heye.

Navên wateyî jî beşek ji wan bandora wan li ser civakê heye. Bi taybetî ew navên hest û helwest û nirxê mirovan dîyar dike. Mînak : ( Zilamtî, dostatî, biratî, ciwanî û azadî....hwkd ) .Ew navên ku li gorî hizir û hestên kesên di civakê de tên gotin, bingeha deronîyê werdigirin. Ev jî bi başî yan jî bi xirabî be. Mînak : ( Tendirust, çekdar, xîyanetkar û cengawer....hwkd ) Yan jî ew tawanê ku buyerekî dîrokî çêkirîye, wekî ( Raperîn ) bingehek deronî heye.

Hevalkarên wekî ; ( Şêrane, zilamane, dilêrane û merdane....hwkd ). helwest û fikrê kesan dîyar dike. Şêweyê cihkirina karekî jî dîyar dike. Alîyekî deronî jî tê de derdikeve.

Karên darêj jî wekî ; ( Têkçûn, lê qewmayî, şewitandin û teqandin....hwkd ) her yek jivan buyerekê radigehîne. Ezmûnek xirap ya wan li gel civaka kurd heye. Ji ber ku bingehekî xirap wergirtîye.

**c- Peyva lêkdayî :** Ew peyvên ji du peyvên watedar yan jî zêdeyî amrazekê pêktê. Amrazên wekî ; ( Dilşad û xûkird ) peyvên lêkdayîne, pişkên wan di bingeha deronîyê de hene. Bi taybetî jî ew hevalnavên ku hestên netewayetî tê dene di rojên dagirkirina kurdan de çêbûne. Mînak : ( Serbestî, xebatkirin, xwegirtin, azadîxwaz, yekgirtin, şoreşger, nîştîman perwer, çûyîna nav çîya û ....hwkd ).

Ew karên ku di serpêhatîyan de hatîne kirin, wekî îşkence, hestên xirap dîyar dikin. Mînak : ( Dagirkerî, Enfalkirin, wêrankirin, qeleçûkirin, sêdaredan û reşbigirî....hwkd ) . Her yek ji van wateyan buyerekê dîyar dike ku bi serê gelê kurd de hatîye. Peyvên wekî : ( Pêşmerge, tundrewî, ajawgir û xwepêşandan....hwkd ) .

Her yek ji van li gorî hest û helwestên kesê axaftvan bingeha deronîyê çêdike. Ji ber ku her yekê di helwestên cuda de bi kartînin. Ev jî li gorî axaftvan tê gohertin. Ji ber ku gelê kurd dibin bandora ayîna îslamê de maye, hinek peyvên bandor li ser wan kirîne hene. Di başîyê de bingehek a başîyê heye. Mînak : ( Xêrker, Quran, Rastbêj, Dadperwer, Devrast û Xweş gotin....hwkd ).

Ew peyvên ku biwêja xirabîyê dikin bingehek xirap a wan heye. Wekî : ( Xêrneker, Xomarker, direwker û ....hwkd ) . Hinek peyv jî li gorî tureya civakê helwest û bingehan digirin.Mînak ; ( Wecaxkur, sersiwalker....hwkd ).

Hejmara ( Sêzde ) di nava civaka kurd de jimarekî lêkdayîye wekî ( Şumê ) tê danîn. Bingehek xirap heye. Jimara ( Şês û şeş ) bi heman şêwe rêxistinek kurd wekî xerîp dide naskirin. Hestekî xirap digehîne.

## 2.2 ÇAWE BİNGEHA DERONÎYÊ WERDİGİRE :

Gelek peyv li pişt wateya ferhengî wateyek din digire. Ev wateyejî alîyê deronîye. Evalî bi ser hemû peyvekê de nayê, ji xeşî çênabe. Belku hinek sedem hene peyv di dema gotinê de bingeha deronîyê werbigirin.

### 2.2.1 Dubarebûn :

Ew peyvên ku di hebûna başî û xirabîyê de bi kartên gelek caran li gek hev dubare dibin. Ji alîyê karhêner ve hêzekî zêde û giran li ser heye. Di hestên kesan de peyv bi bandore.(Ezîz Hena Dawid, 1990, R. 261). Her cara ku peyv dubare dibe bingehekî baş û xirap werdigire. Wateyk din jî pê dibexşîne. Ji ber ku her kesê ku bi kartîne hêzekî deronî pê di bexşîne. Wateyekî zêde jî têxe li ser wateya ferhengî. (Lyons, 1997, R. 449).

Li gorî hest, soz û fikrê civakê van wateyan werdigire. Mînak : Peyva ( Bawejin ) li gel dubarebûna wê û bi hevre hatina wê, li gel peyva ( Bê bezî ) û ( Ji yezdan netirsin ) bûye wateyekî zêde û çûye ser wateya biwêjê. ( (Umêd Mesudî, 2002, R. 50). Her wiha peyva ( Culeke ). Bi hevre hatin û dubarebûna wan li gel peyva ( Çawçîno ), ( Tirsînok ), bûne peyvekî zêde li ser peyva ( Culeke ).

### 2.2.2 Ezmun :

Hemû peyvan bingehek ya deronîyê nîne. Bi taybet jî navên wateyî. Lê belê ezmuna van peyvan wisan dike ku bingehek xirap yan baş werbigire. Mînak : ( Çîyayê Mako ),li gorî ezmunê çi wateyekî bi bandor nîne. Lê belê belku bîranînên hinek kesan bi başî yan jî xirabî li gel wî çîyayî hebe. Yê ku nebe jî li cem wî asayîye. (Loşin, 1990, R. 99).

Hinek navên taybet di civaka kurd de li gel wê ezmuna heyî bingeha deronîyê werdigirin. Mînak : (Şêx wesan, Helebçe, Deşte, Nugireselman, Hekarî û Degel....hwkd). Ji bilî vê jî ajaljî li gorî ezmuna jîyanê deronîyê werdigirin. Mînak : ( Rovî, Bom, Mar, Se....hwkd ). Bingehek xirap ya van peyvan di civaka kurd de heye. (


Pepule, Çulke û mih ....hwkd ) van peyvan jî bingehek baş girtîne. Ji ber ku peyvên amêrekî zindîye û kes têde kar dikin (Resul, 2015, R. 348).

Li gorî rojên jîyanê ev peyv alîyên baş û xiraban bandor dikin. Taybetmendîyên wateyên nû peyda dike. (Resul, 2015, R. 348)

### 2.2.3 Peyva hevbeş û firewate :

Peyvên hevbêj û fire wate yek ji wateyên ( Tbo ) yê ne.Ev jî dibe sedemê ku bingehekî deronî werbigire û bi ser wateya hişekî de zal bibe.

Peyva ( ker ) peyvekî du wateyan dide.




( Ker ) paşgira sêbera wateya ( Ker) a guhdirêj wergirtîye. Bi ser wateya hişî de zalbûye.Nirexekî kêm dide wê paşgirê . Hinek ji nivîsîn ji bo( Ker ) yan jî ( Gorî ) û hinek jî ji bo ( Za ) . Mînak :

| | |
|---|---|
| Sitemker | Sitemkar |
| Yarîker | Yarîzan |
| Rawbêjker | Rawbêjkar |

Her wiha peyva ( Qutabî ) û ( Xwendekar ) du tiştan destnîşan dike. Lê belê ji bo du gotinên cuda bi kartên. Her yek ji wan hest û helwestên cuda radigehîne. Ev jî bûye sedemê ku bingehek deronî hilbigire û peyvekdin bê alî  wekî ( Xêrxwaz ) bi serde zal bibe.

Li gorî hinek kesan ( Xwendekar ) raste û li gorî hinek din jî ( Qutabî ) raste. Yê ku bê alî jî be peyva ( Fêrxwaz ) bi kartîne.

Hinek peyvên firewate li gorî hest û helwestan bingeha deronîyê werdigirn. Peyvên hevbêj jî bi heman awayî dibin û wisan li gel hev bi rêkdikevin. Li gel peyva ( Tabo ) qedexe jî dibin. Ev jî wisan dike peyva asayî têkbiçe. Mînak :

Peyv : Zê

Zê (1)  zê ( wateya asayî )

Zê ( 2 ) zê ( mêyî ) (Dizeyî E. M., Watasazî u Wieşe u Riste, 2014, R. 119).

### 2.2.4 Goherîna deng :

Gelek caran di zimanê kurdî de bi siwana dengekê peyvek û wateyek nû çêdike. Li gel yek peyvên tabo û hevbêjî peyda dike. ( Didan ) di şêwazê silêmanî de tîpa ( d ) wisan dike bibe ( dan ). (Dizeyi E. M., Watasazi u Wise u Riste, 2014, R. 194).Tîpa dengdêr a ( d ) di peyvan de dibe hevbêja ajalan. Mînak : ( Sed ) tîpa ( d ) wisan dike ( se ) bibe wateya ( Seg ). Her wiha tîpa dengdêr di peyvekê de dengê hevbêj çêdike. ( Hewt ) tîpa dengê ( t ) wisan dike ( hew ) bibe dengê ( seg ) goherîna deng jÎ bandorê li ser çêkirîye û peydabûna bingeha deronîyê heye.

### 2.2.5 Hêz û Awaza deng :

Hêz û awaza dengî rolê wan di çêbûna deronîya zimanê kurdî de dîyare. Xazî Fatîh Wysî di derbarê hêzê de dibêje : Ew hêzeye ku dikeve ser kiteyek ji kita peyvê.(Weysî, 1984, R. 84).

Her wateyek dema tê gotin li pişt hêzekê dengekê ji bo armancekî pêşerojê bikartê. Hêz û awaz zû axaftin sedemeke ji bo wateya bi bandor.(Leech, 1974,R. 18): Ji ber ku beşdarîyê di hest û soza axaftvan de dike. Eger di dema gotina hevokekê de hêz li ser gotinê be, armanca wî ewe ku gohdarvan jê fêm bike. Mînak :

- Narîn çîrokek nivîsî.

Eger hêz li ser peyva ( Narîn ) be, ji bo kesê ( Axafvan ) ( Narîn ) kesekî girînge. Eger hêz li ser peyva ( Çîrok ) be ew li cem wî girînge. Eger li ser peyva ( Nivîsîn ) ji be ew kare li cem wî girînge.

Corek din di hêz û armancê de heye. Ji bo çavlêkirina kes û henekkirinê bi kar tê.(Cîro, 1957, R. 33) Mînak :

- îro te ne xwendîye ?(Dizeyî, 2009, R. 41).

Gelek jara hêz dibe sedemê berevajîya wateyê. Mînak : Di hevoka

( Tu azayî )

de,eger hêz li ser peyva ( Aza ) be, gohdarvan wisan hest dike tu henekan lê dikî(Alebîdî, 2003, R. 167). Hêz di vê corê hevokê de bi awazekî nizim destpê dike û di peyva ( aza ) de bilind dibe. Li ser cînava ( bit ) nizim dibe.

Awaza bilind li gel hevoka balkêş de bikartê û bingeha deronî werdigire. ((Alxulî, 1987, R. 170) Endazîya deng jî gelek bandore heye li ser rijandina hestên ( Gohdarvan ) . (Şrîm, 1994, R. 118)

Endazeya deng zengek a muzîkê ya bingeha deronîyê di bexşîne wateya peyvê.

Evan jî wisan bi helbestvanan kirîye ku girîngîyê bidin bi dengê muzîka peyvê û dubarebûna deng. Her corek hest û sozekî deronî dibexşîne . Ji ber ku qafyeyê ji bo hevbeşa hizir û wateya peyvê dibin. (Dizeyî, 2009, R. 41) Xwendina bilind û nizim awazê dengan di qafeyên rizikan de wisan dike corekî yê hest û sozan jê derbikeve. Mînak : Nalî dibêje :

Şadmanî bê wefayî, yarî têrî û mestî

Yarî tenganem xemeba her xemî xûm xûm bûm.

(Kerîm, 1388, R. 248)

### 2.2.6 Navlêkirin :

Di nava civaka kurd de em gelek caran dibînin her navek li pişt sedemekê çêbûye. Hizir û bawerîyên hizirînê di navlêkirinê de bibandore. (Iumer, 1990, R. 112).Ji ber ku dema mirov navek li kesekê yan jî tiştekî dike Çawe dibihîse wisan nav lê dike. Mînak : ( Şoreşger Ajawgêr, Çete, Xîyanetkar, Terorîst û Pêşmerge....hwkd )

Her yek ji van navan wateyekê di hest û sozên wî kesî de dikin. Ji ber ku navlêkirîne bi xwesteka xwe van navan dibêje. Nav li gorî wan hizir û bawerîyan tê gohertin. Li gorî wê xwezaya derdora wî navekî nû pê dibexşîne wekî sembolekê di civakê de bikartîne. Eger li jêr ronîkirina alîyê heskirina mirovan berbaerî heyînekê tiştekê yan kesekê ew bi bandoran navlêkirinê ye.(Ezîz, 2008, R. 63).

Heskirin û kîna mirovan beramberî kes û bûyeran wisan dike navlêkirin bingeha deronîyê werbigire. Wekî ku em dibînin heskirina gelê kurd beramberî ola îslamê wisan kirîyên navênMihemd, Elî, Emer û Osman....hwkd ), li zarokên xwe bike. Evan navan di jîyanê de alîyê geşbînîyê heye û bingehek baş wergirtîne. Mînak ( Welat, Raperîn, Nîştîman û Xak....hwkd ).

### 2.2.7. Derdor :

Dema peyv yan jî hevok bi derdor ve tê girêdan, wêde hevok û peyv wateya ferhengîya xwe windadikin. Li gorî derdora xwe wateyan bi destdixin. Mînak :

_ Pertûke sorekey ser ew mêzeyem bû bêne (Dizeyî E. M., Watay Karîgerî Le Biwarî Ragahandin, 2004, R. 42)

Ew hevoke şêweyê daxwazîye qet ne corek yê bingeha deronîyê ye. Lê belê dema me xist di derdorde belku bingeha deronîyê werbigire. Mînak : ( Eger kesek hevoka destpêkê ji hevalek yê xwe re bêje, ew hevalê wî jî sîxor be mayku filîmek di nava pirtûkê de veşartîbe. Bê goman bandorê li ser wergir dike.(Cooper, 1973, R. 57).

Hemû hevok û peyvên derdor dikarin bingeha deronîyê werbigirin. Ji ber ku gotin ne girînge. Belku armanca wî girînge ku li gorî derdor dibêje. Bingeha deronîyê li gorî derdor ji tiştekê re bê gotin û armanca wî jî tiştek dibe. Di vir de pêwîstîya me bi derdor heye ji bo destxistina wateya armancê.

**2.2.8. Rêkxistina hevokê:**

Cihê peyvan di hevokan de wisan dike wateyekê çêbike. Livandina peyvê di çarçuveya hevokê de alogurkirina cihê peyvê jî wisan dike peyv corên wateyan li dora xwe kombike.(Almtlbî, 1986, R. 88)

1- Mindalekan be cilî rengaw reng hatin. ( Zarok bi cilên rengaw reng ve hatin ).

2- Hatin mindalekan be cilî rengaw ren.   ( Hatin zarok bi cilên rengaw reng ve ).

Di hevoka yekem de li cem axaftvan ( Mindalekan ) girînge. Di hevoka duwem dejî ( Hatin ) li cem wî girînge. Mirov eşkerekirina wî fikrî û hestên di deronîyê de, berbi rêkxistina peyvan ve diçe. Ta bi yekgirtina hebûna wan li gel şêwazê hizirîn û fikrekê bizivire û bi guncê.(Salih D. E., 2014, R. 200).

Rêzkirina peyvan di hevokekê de alîyê deronîya axaftvan nîşan dide. Bêjer ji bo aramanca beramberî peyvan di nava hevokê de alogur dike. Mînak :

Pirtûkek baş ji bo kawa hat.

Kawa perûkek başî bû hat (Dizeyî E. M., Watay Karîger le Biwarî Ragehandin, 2004, R. 40)

Her du hevok jî di yek hizrî dene. Lê belê di hestê de cîyawazîya wan heye . Ji ber ku bêjer alîyê rêzimanî hilbijartîye û baş jî dizane armanc ji bo gehandina kesê berambere. (Ahmed, 1989, R. 77).

Hinek peyv hene di xwezayê de bingeha deronîyê wergirtîne. Bi taybetî ew peyvên ku wateyekê didin nirx û bihayan . Mînak : ( Azadî, Dadperwerî û Yeksanî....hwkd ). Her wiha reftarên xweşik û ne xweşik yên wekî ( Ciwan, Puç, neşirîn û xirap....hwkd ). ((Elî M. M., 2010,Rp. 98)

### 2.2.9 Pêwîstîya cih û dem dinava du peyvan de :

Pêwîstîya cih û dem dinava du peyvan de wisan dike ku, bi karanîna yek ji wan re pêwîstîya wê bi karanîna yadin jî be. Her du peyv jî wateyekê di bûyer an jî serpêhatîyekê de dike. Bingehekî deronî ji bo peyva bi karhêner çêdike.

Mînak :

( Sala lafaweke ) , ( Salî giranîyeke ).

Peyva ( Sal ) li gel ( Lafaweke ) her du jî behsa demekê dikin. Belku di vê salê de bûyerek nexweş yan jî xweş çêbûyî be. Ev bûyer bi pêwîstîya her du peyvan ( Sal û bûyer ) tê.

### 2.2.10 Bikaranîna peyvê :

Alogurkirina peyvê di nava xelkê de hinek alîyên deronîya bikaranînê pêve di zelqîne. Mînak: ( Peyva ( Term ) ji siha peyva ( Ceste ) hatîye girtin. (Elî M. M., 2010, R. 97)

## 2.2.11 Zivirandin :

Hinek caran bêjer peyvekê bi peyvek din di goherîne û di alîyê wateyê de jî nêzîkî hevbin. Di alîyê civakê de jî hatîbe pesend kirin. Zivirandina wateyê ne ji ber xweye. Belku ji bo armancên cuda van karan bi kar bîne.(Salih D. E., 2014, R. 200). Her wiha zivirandin di nav goherîna du tiştan de, pêwîste di rastîyê de peywendîyekî gelek li gel hev hebin. (Feteh P. D., 2010, R. 202).

Zivirandin bandora wê li ser alîyê deronîyê heye. Her çiqas zivirandina wê bi hêztir be ew qas jî bandora wê jî bi hêztir dibe.(Elweîr, 1994, R. 158).

Zivirandin ji bo armanca bandorbûyînî serîhildide. Zivirandina wateya bi zorî di hunera Rewanbêjî de wekî ( Şibandin, Xwastin, Gotin, Xwaze....hwkd ) tê dîtin . Zivirandina di zagona ziman (Kohîn, 1986, R. 66), Mînak ( Xanî ) dibêje :

Neylo feredil, tu aftabî.

Ten şbhî ketan, tu mahtabî.  (Perwerde, 2013, R. 201).

Di vir de yara xwe şibandîye gula neylufer û ketan, roj û heyîvê.Hestên bi hêz yên helbestvan dîyar dike. Wateyekî zêde xistîye ser wateya binçîneyê. Gelek caran zivirîn dibe sedemê zêdebûnê. Şêx Reza dibêje:

Be tehrîkî telêk sed hezar nefsî be kuştin.

Reyîs hîle karane şax qumar bazane, em rîşe.

Herî zêde du bandorî di vir de heye, yan kes birîndar dike yan jî bilind dike. ((Ebdulcelîl, 2006, R. 356)Di her du alîyan de jî bingeha deronîyê wergirtîye.

## 2.3 ALÎYÊN BİKARANÎNÊ :

### 2.3.1 Alîyê ragihandinê :

Di roja me ya îro de ragihandin bûye beşek girîng û bibandor ya li ser jîyana kes û civakê. Buyîye temamkerî karên jîyanê. Ragihandin şer li gel hemû çîn û mijarên civakê dike. Pêwîstîya wê bi jîyana kese. (Welî, 2013, R. 83).

Ragihandin bi hemû coran pişt bi wateya deronîyê ve girêdide. Ji ber wê jî ber bi wan peyvan û şêwazan ve diçe ku bandorek bi hiz li ser deronîya kes de heye. Di rêya wan peyvan de hewil dide li ser hiş û rastîyan de zalbibe. Bi hemû hêza xwe a manewî hewila kontirolkirina gelan ve bide. Ji ber ku ev peyv aramncê pêktînin û bandora wan li ser milet heye.(Dizeyî E. M., Rehendî Deruni Le Biwarî Rageyandin, 2005, R. 74).

Fikrên wî jÎ li ser darîştina aqlê mirovan kar dike. Peyv jî çiqas dengdêr be serkeftin ji bo wa hêsantir dibe. Soz û hêz û bandorî wisan dike serkeftinê bi dest bîne.(şilîr, 1972, R. 16).

Regihandin bi hemû corên xwe bandorê li ser deronîya guhdarvan û bîneran dike. Her yek ji wan bi corekê bandora wan heye û armancên cor bi cor di pişt wê deye. Beşek ji peyamên ragihandinan hene ku bandorê li ser goherîna helwestên kesan dike. Ragihandin ew hêza goherînê heye di hizir û fikrê pêkêşîyê de.(Xidir, 2002, R. 60).

Hinek jî li gorî armanca bîneran bi kartîne. Ev jî dirêya hewlên kêm û balkêş de derdikevin. Ji berku soz û atîfa mirovan bipeyva asayî kar tê de dike. Bandorekî negatîf

yan jî pozîtîf jÎ çêdike. Civak gelek caran jî ji bo wirjandina bi giştî bi kartîne. Ji bo pêşkêş kirina armancê ya wan alîyan bi xwe di xwazin çêbikin.(Xidir, 2002, R. 60)

Ev core jî herî zêde di dema şer, li hevdan, xwepêşandana gel a li ser cadeya, kar pê tê kirin. Ew peyvên û gotinên ku wateyê di helwstên kesên kurd di alîyê ragehandinê de derdikeve hole. Mînak:  Serkewtin betêkoşan.

Debêt yek rêzî gel bi parêzîn.

Gelî kurd sore ler ser bedîhênanî mafekan.

Beyek girtin hemû hewlekanî dijmin le gordenên.

( Tekoşîn, Yekrêzî gel, Mafe, Serkeftin, Yek girtin, Bi hevre jîyan....hwkd ). Her yek ji van peyvan bandorekî pozîtîfî li ser kesên civakê de heye. Ji ber wê jî bûne hêvênê peyaman.

Ew şêwazê ku di ragihandinê de bikartînin jê re dibêjin( Propaxanda ), belku girîngtirîn rêya ragihandinê be di karanîna peyv û şêweyê sozdayînê de. Serkeftinê dide bêjer ji bo ku armancênxwe bi gehîne. (Yunis, 2007, R. 224).

Her wiha gotara sîyasî şêweyek ji şêweyên gihandinê ji bo armanca bibandor a li ser gel pişt bi bi wan peyvan ve girê dide ku hest û sozan dîyar bike. Ew peyvên ku di gotarên sîyasî yên kurdî de belvabûyîn û hatîne naskirin pêktên ji : ( Dadperwerî, Terorîst, Serbixwe, Dîktator, Nehes, Xwefiroş , Dijmin, Serbestî, Yeksanî , Maf û Kevinperest....hwkd ).

Di gelek gotarande ev sembol bi kardi anîn. Di deron û mejîyên kesên civakê de heyîna wan heye. Ji bo gehiştina armancekê hewil dide. Gelek caran jî partîyên sîyasî di dema hilbijartinan de ji bo bandorkirina xelkê û bi destxistina dengan, van peyvên bingeha deronîyê heyîn bi kartînin.

Mamoste pêşengên gelin.

Helebçe sembola Şehîdane.

Kerkud dilê Kurdisstane.

Xwendevan pêşerojin.Ragihandin erkê ziman berfirektir kirîne ji bo ku tenê ji armancê xwe fêm bikin bi kartînin. Belku Ji bo bi destgirtina desthilatîya xwe bandor kirina ser xelkê be. (Alzubîdî, 1998, R. 111).

Hinek caran jî ragihandvan ji bo gotina hestê û sozên xwe yan jî eşkerekirina helwest û hizrên xwe, peyvan hildibijêrin. Ev jî wateyekê di hizir û fikrên wan de dike. Mînak :

(Selefî, Tundrew, Xebatgîr, Ajaweçî, Pêşmerge, Mîlîşya, Xwînrêj, Can fîda, Yaxîbûn, Xîyanet, Grupekî qedexekirî, Pêşîlkirin....hwkd ). Her yek ji van peyvan ji bo armanca alîyê ragehandinê hatîye hilbijartin.

**2.3.2 Sîyaset :**

Sîyaset yek ji alîyên jîyanê ye. Ji bo cîh anîna armanca ye. Heya demekî zêde pişt bi ziman ve girêdide. Bi cihanîna van armanca jî di erkê civakî û ziman deye.(Şemis, 2006, r. 13).

Sîyaset di cîhana îro de bialîyê civakê û perwerdeya ayînî re perdepoş kirîye. Ev jî bandorekî desthilataye ne ya xwezayîye. Zimanê sîyasetê bi deronîya zêde tê wênekirin. Destewajeyekî bi hêz û bilind têdeye. Di sedemê ku çêbûna sedeman di nav bera rastî û fêmkirina bêjer û wergir de. Ev jî rewşekî gelek tirsinake. Kes bi sîyasetê ve mijol dibe mîratek ji bo kesên piştî xwe bi cih di hêle û hinek din jî dihêlin. Eger armanca wî revîn be yan jî zeftkirin be.

Wateya deronîyê di karê sîyasî de ji bo armancekî taybet û piştgirîyê di hizir û bawerîyan de kardike. WateyekÎ rast û vekirî didanin û wateya deronîyê di alîyê sîyasetê de bi wateya hizir û bawerîyê ve didanîn. Bandorek zêde li ser asayîya civakê heye bi taybetî jî di dema tengasîya sîyasî û aborî de.

Alîyên sîyasî wekî amrazekî ji bo berdewamîya karên xwe di civakê de ji rastîyan revîn bi kar tînin. Zimanê sîyasî yê roja me ya îro serweredi li ser hest,hişên raste rast yanî ne raste rast ê ser xelkê de. Zimenekî ne temame. Nerî û şilî tê de windaye, bê

awaze dure ji ciwanî û acizîyê birîndarîyê di nava xwe de digire. Peyvên wê şer li gel hest û sozên xelkê dike ne mejîyê wan.

Dernonîya wê gelek caran bi armanca rijandina hest û sozan bi destxistina armancan wisan dike ku ( Rastîyê bibe ne rastî ) û ( ne rastî jî bibe rastî ). Ev jî dizivire ser wê desthilatdara ku li pişt wêye.Mirovên sîyasî bi bandor dibin û dibin sedemê razîkirina pêşkêşîya goherînê di rêya tirsê de (Osman, 2008, r. 13).

Her wiha wekî çekekî bi hêz ji bo dirêjkirina mayîna xwe bi kartîne. Ji ber sîyaset, di cîhana îro de tenê ji dariştina pîlana cengê pêknayê. Belku pêktê ji zimanekî dîplomasî û veşartî. (Osman, 2008, R. 51)

Karanîna vî zimanî jî xwe di peyvên bi bandor û hestên dengdêr de dibîne. Ji bo berjewendîya xwe bi kartînin ji bo ku xelkê bêxin dibin desthilatdarîya xwe de. Ji bo ku rakirina rastîyan û nêzîkbûna rastîya tê fêmkirine.

Di sîyasetê de ji bo aramkirina rewşê durxistina ji şer sîyasetmedar hinek peyvên deronî yên bi ser danusitan dinê bikartînin. Sîyasetmedar pêwîste bizane çawe ziman bi kartîne û peyvan hilbijêre da ku bandor bibe ser kesên beramber. Ev jî danustandina di navbera wan de bandor dike.(Elî E. M., Zimanewanî Sîyasî, 2013, R. 116).

Di dema çêbûna pirsgirêk û nakokîya di navbera partî û alîyên sîyasî de, ji bo armanca çareserkirina çêkirina nivîsîngehekî aram berbi wan peyvan ve diçin rolê wan di deronîya mirovan de heye.

Dibin sedemê geşbînî û bexşînê. Mînak : ( Aştewayî, sazan, tebayî, yekrêzî, bihevre jîyan, hevxebat, asayîş, asayîya dewletê, xweşîya xelkê,, bilindkirina xelkê, rêkkeftin û piştgirî....hwkd )

### 2.3.3 Alîyê wêjeyê :

Wêje bi her du corên ( Helbest û Pexşanê ) re xakekî tîpîne ji bo afirandina peyvên deronî. Ji bo armanca rast  mijarên xweşik bandorê li ser gohdarvan dike. Di alîyê wijdanî de hest û soz

Bandora wêjeyê bi giştî bi çêbûna wênyekî bi hêz ve girêdayîye. Di encama karanîna peyva bihêz û bandor de wateya ferhengî çêdibe. Yan jî komek hêzên deronî di mijarekî ya wêjeyê de xwe dibînin.

Nivîskar û helbestvan  di pirojeya  şêwaza wêjeyê de dikarin bandorê çêbikin. Di karanîna van peyvan de hêza dengdarê li ser gohdarvan heye, bi şêweyekê wateya peyvan bînin di nava wijdan , hest û sozan de. Ev jî bi wê çêdibe ku peyama nivîskar dewlemend be û peyvên tê bargawî dibin bi vê hizr u xeyala ku hez pê dike u tev jiyaye peyv u derbirîabargawidibin bi hestu sozên li ruyê helbişartin u musîqayê u rêkxistin u pişta u pêşxistin u labirin u kêmbirî u dirêjbirî,heya rengdanewekîguncaw u karîger bên dirust. (DizeyR, Şêwaz û Piragmatîk, 2012, R. 31).Tişta herî baş bikare bandorê li ser wan tiştan çêbike hestên xelkê û tamgirtin yan jî êşa waye. Bandorî û wijdanîya xelkê bi endaxeyîya fêmkirin û wergirtina mijarên wêjeyîye. Xendekar û gohdarvan ji kesekê ta kesên din cîyawazîya wan heye (Yunis, 2007, R. 255)

Ji bo durîya goşeyê nîgarê mijarê helbestvanan hemû ew sinorên ku peywandîya wan bi wateya serkeftî ve heye bezandîne û berdestkirîne. Wêje bi şêweyekî giştî bandorê li ser deronî, hest, soz xwendevan û civakê giştî dike. Bi taybetî jî di helbestan de.

Helbest di pişt de wêneyekî endîşeyî çêdike. Ji ber ku helbestvan di kare di wê rêyê de destbi ser xwendevan de bigire.(Dizeyî, Şêwaz û Piragmatîk, 2012, R. 47). Nivîsînên helbestvanan ji bo vegotina hest, sozê deronîye û xizmetkirina welat, behsa derd û êşa gelê wan bû.Li pey dîmenên jÎyanê, pirsgirêkên civakê, sîyasî, xwezayî û xweşikbûnê gerane. Evan heyînan jî bandorê li ser hest û soza wan kirîye. Helbestvan bazarekî taybet li gel peyvan dikin û bi şêweyekî asayî bikar naînin. Belku bi corekê bi kartînin ku corekî efsaneyî bi bexşînin (Dizeyî, Şêwaz û Piragmatîk, 2012, R. 47)

Helbestvan dîmenê hêvî, hest û deronîya xwe çêdikin. Helbestên wan neynîkekî pak ya hest û soza helbestvana ne.Mînak : Zîwer dibêje :

Ey weten çend xoşewîstî ruhî şirînî minî.

Hezreey tuxmî îşan û baes zînî minî. (Mistefa, 2011, R. 131).

Helbestvan wêneyekê sazdike û bi pisporî dike ziman û ew soze jî di deronîya wî de berçave. Zimanê helbestan di alîyê hest û sozan de dewlemende. Wijdana mirovan jî aram dike. Peyv û hevokên bihagiran bi hest û soza di hilbijêre. Armanca wî jî bandorkirina ser kesê beramber û çêkirina bersivekî wijdanî li cem xwendevane. ( (Dizeyî, Şêwaz û Piragmatîk, 2012, R. 47).

Bi serhildana wan bûyêrên sîyasî ku bi ser kurdistanê de hatye. Hestên kurdewarî, nîştîmanî, heskirina xakê, şanazîkirina bi zimanê welat bûne babetên serekî yên naveroka helbestên kurdî. Ji ber wêjî ( Helbestên sîyasî ) serîhilda. Ji bo hişyarkirina gel û bidest xistina mafên xwe. Naverokên helbestên wan piranî wate dayîne xwestek hêvîya gelê kurde.

Peyvên wekî ;( Qurbanî, heskirina niştîman, yekgirtin, yeksanîya jîyanê, xwîna lawan, kurê xebatê, Serbixweyî azadî, xaka welat, kurd gelekî kevne, serbest, ey kurdino, ey merdîno û bawerîya me....hwkd ). Ev peyv hemû wateyên didin jîyana kurdan. Wekî alavekî bi bandor di helbestên sîyasîde tê bi karanîn. Helbest giştî xweşiktirîn şêweyê zimanê deronîyê ye. Helbest jî wêneyên bûyerên dîrokî yên veşartî yên netewî wergirtîye. ( Cewher Kirmanc ) ji bo Helebçe dibêje :

Helebçe............ bêşikî û colaneyî

Ehmed muxtar û Goran bawe

Helebçe

Cêgay nezrgey aşiqan bû.

Helebçe tacî serwerî

Şehîdanî Kurdistan bû. (perwerde, Ziman u Edebî Kurdî bo Poli yazdem amadeyî, 2015, R. 138)

Vegotina hest, soz, wijdana mirovan tim bi zimanê helbestan na vebe. Helbest zimanekî taybete. Cîyawazîya wateya peyvan di wateya ferhengî de dimale. Wateya sozdayînê pê dibexşîne. Peyv bi şêweyê ( Hêma ) yanjî ( Nîşan ) di mijarade û di helbestan de tê gotin. Ev jî ji bo gehandina armanca dîyare.

- Me biryarda yan emê bi azad bijîn yan jî emê bi mêranî bimirin.
- Beser çû em dem.
- Le roy bêgane sernewî kird ( Hejarî Mûkiryanî ).

(Ehmed Selman) helbestcan komek helbestên binavê, (Ristî Wişey Agrawî)nivîsyîye. Helbestvan lêjêr navê peyvên agir yên dijî dijmin û qurbanîya bi wateyekî dur a felsefê daye nivîsandin.Dibêje :

Emewî ruy dil û demim.

Ruy nasorî zam û dlm.

Bigeynm naxî  diltan.

Ey bawkrî roley kujraw.

Helbestvan dilsozî, canê paqi, rewşa deronîya xwe hemû daye hêvîya peyvan. (: (Celal, 1997, R. 166).

**2.3.4 Şerê deronî :**

Peyvên deronî, peyvên bargiran yên di nava civakê dene. Çawe bikaranîna wan dinava civakê dedîyar dibin ? Wesfa rewşek yan jî tiştekî dikîn. Wateyekî bi bandor digehînin. Karanîna wê ya li cem kesan de bandora wê jî tê gohertin.

Ev peyvên deronî di şerê deronî de û bi taybet di alîyê sîyasî de dikevin berçavan. Sedemê wî jî goherîna hest û pêşkêşîya hizir û bawerîyan ne. Ji ber ku şerê deronî pêktê ji , şerê goherîna reftar, hizir û bawerîya kesan. Çeka wan jî ewe ku di dema goftugoyê de karanîna peyvên deronî û bi wêre şoştina mejî. (Alemdanî, 2012, R. 18)Peyvên sozdarî di encama şerê deronîyê de derdikeve û serkeftina xwe misoger dikin. Wekî çeke kêye didema şer de bikartînin. Çekeke îradeya parastinê belav dike. Hewildide canê

manewî yê dijmin biroxîne.(Sebri E. M., 2013, R. 111)Peyvên wêrjêner di şerê deronîyê de bandorek ya wan a erînî û nerênî heye. Bandora nerênî wekî wirjandina tirs , dillerzîn....hwkd. Xwelk hewil dide xwe ji destgirtinê hilwasandin û roxandinê bi parêze. Lê belê bandora ernênî jî bawerîyê çêdike û piştgirîya canê menewî dike.(Dawid, 2003, R. 10). Di şerê deronîyê de rolekî bi bandor dibînin. Bi taybetî jî di belavkirina propaxandaya, dariştin û çêkirina diroşman bi şêweyekî locîkî, ( Hişî, Mantiqî ).

Her alîyek her rêvebirek ji bo serbazên xwe berjengên wekî ( Bihêz, Zîrek û Qehreman ) bikartînin. Berjengên xirap yên wekî ( Bêhêz, dirindeya terorîst, tewanbarên şer û....hwkd ). Ev jî berjengên xirap yên nerênîne(Sebri E. M., 2013, R. 110), R. 110) Di rêya peyvan de dikarin kontirola hest, sozên kesên civakê bikin û bêxin di jêr bandora xwe de. Dikare tirs, dillerzîn, dudilî, lewazî û bawerîyên bi goman û xirap jî li cem wan çêbike. Peyv û gotin du alîyan di mava xwede digire.

**Yekem :** Ew peyvin ku nîşandana xalên pozîtîf û balkêşîya xelkê kişandine ser xwe. (Hisên R. M., 2010, R. 56)

**Duwem :** Wekî çekekê li dijî dijmên kevin û navxweyî bikartînin. Reftarê wan jî tê gohertin. ( Ji bo bê bingeh nîşandan û kiçikirina helwestena, xistina çavkanîya ji bo karanînê(Nuzerî, 2007, R. 104)

. Evşere mejî dihejîne, reftar dide gohertinŞerê deronî şerê sîyasete  şerê dengîye. Pêkhatina alavên şerê deronî û peyvên deronî, ji bo goherîna bîr û bawerîya wane. Gelek caran goherîna kesayeta mirovan û ji navbirina kesayeta wan dike.Hinek peyvên di şerê deronîyê de bi peyvên zilmê hatîne naskirin. Li dijî beramberî xwe gelek tund û bihêzin. Herî zêde ji bo armanca nerazîbûn, rexnekirin, kêmkirina alîyê beramber û têkşikandina hestan bi kartê. Bandorekî negatîfî jî li ser kes û civakê çêdike. Hinek peyv hene ji alîyê desthilatdar û rêxistinan ve hatîne qedexekirin. Bi karanîna wan peyvan, bandorekî xirap li ser wan çêdike. Di heman demê de derona wan jî dihejîne.

Mînak : ( Gendelî, dizî, desthilata bi mal, hukmeta karubarê ker, bindîwar, talana neftê, tangera neftê û hikmeta pîne û pacikan....hwkd ).

Hinek partî û alîyên sîyasî, hinek ji peyvan ji bo armanca gotina hizir û bawerîya sîyasî û şerê deronî bi kartîne. Her komek ji peyvan ser bi alîyekî yê sîyasî bûne û her alîyek li gorî xwe bikartîne. wekî; ( Xwendekar, Malbend, Heval....hwkd )

( Qutabî, leq, kak....hwkd ).

Peyvên deronî wekî hemû ew heyînên din ê jîyanê di karanîna peyva deronîyê de armancek dîyar û taybet ya wan heye. Peyv, di şerê deronîyê de alîkare ji bo serkeftinê. Li cem rêvebiran jî peyvên deronî bandorekî li ser bawerîya dijmin, helwest û lewazîya wan dike. (Elhemdanî, 2012, R. 21).

Peyvên deronî di şerê deronîyê de dibe sedemê bandora tovê duberekî di nava dijmin û hevpeymanan de. Dibe sedemê çêkirin û rêgirîya nêzîkbûna sîyasî û aborî. ((Ewad, 1984, pR15). Her wiha bawerîya wê li ser goherîna kesayeta mirov, bawerî û helwesta wan heye. Peyvên deronî dibin sedema lewazîya dijmin.Ev jî dibe sedemê ku di rêya eşkerekirina xirabîya sîstemê di alîyê, aborî, sîyasî û civakê de. (Aladrîs, 1999, R. 47). Gelek caran jî ew kesayetên ayînî û sîyasî yên di dîrokê de binav û deng, sîyasetmedar ji bo berjewendîya xwe wekî sembolekê bi kartînin.

Mînak : ( Barzanî, Şêx Mehmud Berzencî, Qazî Mihemed....hwkd ).

Peyv, di şerê deronîyê de giranîyek zêde heye. Di şikandin yan jî şikandina armancên serekî yên şer de. Ji ber ku wekî wan peyvan bi hêz be. Eger ev peyv nebin dijmin bi asanî dikarin bigehin armanca xwe.(Hesen R. S., Taybetmendîy Zimanyekanî Wişe û riste Le Şerî Derunîda, 2014, R. 57).

Peyvên deronî di rêya gotar û piropaxanda diruşım û peyamên sîyasî de belav dibe. Ne şerte ku hemû deman peyvên deronî peyvên wirjandinê be. Gelek caran jî peyvên asayîjî bandorekî bi hêz li ser alîyan çêdike. Bi cih nekirina karên xwe û û berevajî kirina kar herî zêde dirêya dubarekirin û axaftinê de pêktê. Mînak : (Ême ew doxe têdiperîn, kirdar şerte....hwkd ). Ev peyvane wateyekê didin hest û sozên civakê. Alîyên sîyasî ji bo berjewendîya xwe û armanca piştgirî û bi destxistina armancê xelkê bi kartê. Wekî : ( Dadperwerî, Demukurat, Serbixweyî....hwkd ).

**2.3.5 Alîyên Fêrkirinê :**

Di civakê de perwerde yan jî fêrkirin bandorek ya xwe li ser jîyana mirovan heye. Ji bo mirovan di hemÛ alîyên jîyanê de pirojeyeke. Di heman demê de ji bo fêmkirina reftarê civakê ye jî(Salih P. E., 2013, r. 40).

Perwerde, girîngî dide bingeha civakê û li ser rêçkeya aqil û mantiqe. Ji bo bicih anîna van bingehê civakê amêr û amrazek heye. Daku van reftaran û bawerîyên civakî bi gehîne nifşên nû. (Salih P. E., 2013, r. 40)Bê goman ev amaraze jî pêktê ji axaftin û karanîna peyvên guncaw. Bi vêre jî zanyarîyan di gehîne xwendevan û nifşê nû. Ji bo asankirina fêrbûn û têgehiştinê, vê pirojeyê pêwîstî bi asanîyê heye.

Perwerde û fêrkirin peywendîyek di alîyê deronîyê de heye. Ev jî wekî bingehe ya serkeftina vî alîye. Pêwîste di dema fêrkirinê de temaşeyî alîyê deronî yê xwendevan bê kirin. Peyvên deronî ji bo çareserkirina deronî pirsgirêkên fêrkarîyê û perwerdekirinê ye. Bandora wê li ser fêmkirina xwendevan jî heye. Zimanê perwerdê pêwîstî bi zimanekî nerm û aramî bexşîna dilê xwendevane. Bê goman ew mamostayê ku li gel xwendevana zimanekî bi nerm bikartîne ji derve jî tê heskirin.

Zimanê mamosta di alîyê perwerdeyê de xwedî bihayek û nirxekê ye. Pîlanê wan hemû jî bi şêweyekî giştî bi rêkûpêk bi bername birêve çûye. Lê belê şêwazê axaftinê hişkbe, peyvên wê ne şîrîn be û birîndar be wê di hemû pîlana de şikestinê bîne.

Bi karanîna peyva ( Pozîtîf ) re xwendevan bawerî bi xwe tînin û alîyê geşbînîyê jî li cem wan çêdibe. Bi şêweyekî raste rast bandorê li ser goherîna pêşkêşî, hizir, fikir û reftarê xwendevan dike. Ji ber ku alîyê deronî kar li ser sing, aqil û reftarê mirovan dike.

Eger fêrker kesekî jîr be, dema eşkerekirina peyvên xweşik û bi bandor de wê xwendevana matmayî bi hêle û bala wan hemû bikêşe serxwe. Ew kesê ku erkê pewerdê li ser xwe digire hewildide peyvan bide fêmkirin ji bo bi cih anîna erkê xwe.

**2.3.6 Ayîn ( Ol ) :**

Di her civakê de ayîn xwedîyê taybetmendîyên pîroze. Cihê ayînê di hemû civakan de bi bandore û desthilatdarîya wê heye(Ebdulrehman, 2008, r. 52). Zilamên Olî yên

wekî ( Mela, Seyîd û Şêx ) di nava civakê de cihekî girîng yê wan heye. Her dem hizir û fikrên wan te pejirandin. Di heman demê de ji bo pirsgirêkên di nava civakê de jî tên bikaranîn. Bandora mirovên olî li ser kesên di nava civakê de dîyare. Bi taybetî ew gotarên di roja înê de û di roja cejnê de tên gotin bandorek bihêz ya xwe heye.

Ayîn bi şêweyekî giştî û gotarên roja înê û cejnê bandora wan li ser hest û soza mirovan de heye. Bandora gotarê jî peyvên destewaje û derbirînê ne. Ew peyvên di gotaran de, yan jî di gotarên xwe de bikartînin rolekî bi bandor li ser gohdarvan û kesên amade dike. Bandora pozîtîf û negatif ya gotaran jî derdikeve. Wan peyvan nîşa ciwan û pîremêran dikin ku kesayeta wan baş bibe. Dakû berdewam bibin li ser xwedaperestî, reftarên baş û rast gotinê. Bandorek baş ya wan bi ser wan de dîyar dibe.

Mînak : Komela ciwan, heskirina Pêximberê Xweda rêza wan heye. Kurdistanjî pêwîstîya wê bi ciwanên wekî we destnimêj heye. Hun mala xwedê ava dikin. Şeytan ji ber we direve.: (Şemis H. E., 2006,r. 104)).

( Ey kesên hazir û amade yên birêz. Ey heskirîyên xweda û pêximber, mizgeft bi hatina we xweşe. Ey xuşk û jinên serbilind û xwedî îman. Inşallah hûnê di her du cîhana de serkeftî bin. Xweda nura îmanê bi we û dilê we bi bexşîne. Xwede rehmeta xwe lê bike. Xweda hîdayetê bide we û we ji roja qîyametê rizgar bike). Ev corên goarên ayînî bandorekî baş li ser pîr û ciwanan çêdike. Ji bo zêde hatina wan a ji bo mala Yezdan, destgirtina zagonên ayînê , encamdayîna karên baş û dest ji karê xirap berdan.

Gelek caran gotarbêj alîyên negatîfî bi ser civakê de çêdike. Dibin sedemê sarbûna wan ji rêya ayînê û hatina wan ya ji bo mizgeftê. Ev jî ji ber tundî û tîjîya alîyê deronî û gotina peyvên birîndar û bitirs. Wekî :

( Kurdisatan pêwîstîya wê bi mirovên xayîn û xwe firoş nîne. Pêwîstîya wê bi ciwanê destpîs û şerep xwer nîne. Mirovên gendel, tewanbar, mirovkuj, dizî xîyanetkar li cem yezdan sivikin. Yan jî peyv bi şêweyekî tiwanc lêdan derdikevin, bermaberî kesek , çînek yan jî civakekê. Wekî :

( Ciwan pêwîste di ayîna îslamê de destbi destê nimêjê be û berê xwe bide mizgeftê. Jin jî pêwîste berê xwe bide yezdan û sergirtî be ). Ew peyvin ku geşbînîyê dibexşin û alîyê wan ê baş li ser civakê deronîya civakê heye. Ew peyvên din jî rureşbînî û alîyê deronîya xirap bi ser civakê de bi cih dihêlin.

**2.4 RÊJEYA WATEYA DERONÎYÊ :**

Pîvana peyvên deronî ji bo situna peyvan dîyar bike. Mirov hestên xwe bi başî, xirabî û neşirîn...hwkd dibêje. Ev heyîn û wateyan cihê balkêşî û girîngîyekî zêdeye di zimanevanî û zanyêrîyên deronîyê de. ( Çarlos Osgod, C Osgood ), ( Corc Sosî, Socîg ) û ( Pol Tanbam P Taunen Bavm ) di pirtûka pîvana wateyê de di sala 1957 an de, pêvanek ji bo ( Watya Wijdan ) û wateyek bi ( Cudakirina Sîmantîkî ) da nasandin. Di rêya wê de jî eşkerekirina pîvanê yek li pey yek ji bo dîyarkirina wan pîlanên di kevin nav du hevalnavên dijî yek. Wekî di van heft pîlanê jêr de me dayî eşkerekirin.(Humer, 1982, r. 43).

Baş Xirap

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Yekcar baş | Gelek baş | kêm baş | nebaş nexirap | kêm xirap | zêde xirap | yekcar xirap |

Ebdulwahid Mişrî di ( Nameya Diktoratî ) de ev pîlane danîye. ((Dizeyi E. M., Watay Karigeri Le Biwari Ragahandin, 2004, p.44).

1- Yekcar : peywendîyekî zêde dinava zareva û cemserê de hebe.

Baş Xirap

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Yekcar baş | Gelek baş | kêm baş | nebaş nexirap | kêm xirap | zêde xirap | yekcar xirap |

☆

2- Zêde : Ew rêjeya peywendîyekî kêm hebe dinava zareva û cemsera baş de.

Baş Xirap

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Yekcar baş | Gelek baş | kêm baş | nebaş nexirap | kêm xirap | zêde xirap | yekcar xirap |
| | | | | | ☆ | |

3- Kêm : Ew rêjeye ku heya demekê peywendî bi herdu cemseran ve heye.

Baş Xirap

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Yekcar baş | Gelek baş | kêm baş | nebaş nexirap | kêm xirap | zêde xirap | yekcar xirap |
| | | | | ☆ | | |

4- Navend : Ew rêjeye ku çiqên wê radeyekî temam û bê alî wergirtîye. Di nava her du cemseran de nebûna peywendîya di navbera zareva û cemseran de radigehîne. Wekî :

Baş Xirap

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Yekcar baş | Gelek baş | kêm baş | nebaş nexirap | kêm xirap | zêde xirap | yekcar xirap |
| | | | ☆ | | | |

Ev core rêjeya wateya deronîya cîyawaz û fikrên kesan têxe berdestan ku hest pê dikin.

### 2.5 ALÎGİR Û BÊ ALÎGİRÎYA PEYVAN :

Peyv di ziman de nirx û bihayê xwe heye. Mirov di jîyanê der ruberuy çendîn peyvan tên. Hinek caran jî rastî êşê û ne aramîyên tên alîyê nerînî jî li ser hestan çêdike. Hinek caran jî aramî û xweşîyê jî pê dibexşîne. Dîsan alîyêkî nerînî li ser hestan çêdike.

Hinek caran jî qet bandorîyê çênake. Ev jî dizivire ser wê bandorê ku peyv heye li ser hestê kesekê ye. Mgdugl dibêje : Jîyana mirovan hêvîya turek ya hestane beramberî kesayeta xwe. Yan jî tureke ji bo bihîstina gotinên xwe(Liwîs, 1959, R. 113).Di vî alî de peyv bêyî ku bandorê li ser hest kes û civakê bike, bi vî awayî emê destnîşan bikîn wekî li jêr me dayî dîyarkirin.

### 2.5.1 Bê Alîgir :

Peyvên bê alîgir, ew peyvin ku di gotinê de qet bandorekê çênakin. Dema mirov wan peyvan jî dibihîse rastî çi nexweşî û ne aramîyê nayên. Di gotinê de ev peyvên bê alîgir di alîyê gohdarvan ve qet bandorek ya wan nîne. Bi wateyk din jî peyvên bê alîgir ne serbi çi alîyekê ne (Hesen R. S., Taybetmendîy Zimanekan Wişe û riste Le Şerî Deronîda, 2014, R. 57)

Di alîyê gotinê de qet wateykê nadin alîyê dîyarkirî. Peyvên bê alîgir ew peyvin ku gelek caran di demên pêwîst de derdikevin. Di encama serhildana heyînekî nu de yan jî derketina amêrekî nude wisan dike peyvên nû bê afirandin.(Hesen R. S., Taybetmendîy Zimanekan Wişe û riste Le Şerî Derunîda, 2014, R. 51). Lê belê carna jî bêyî ku heyînek yan jî tiştekî nû serhilbide, peyvek nû bi armancekî bê alîgir serîhildide. Ji ber ku ew peyvên beramberî heyînekê hene bargawî kirîne û bûne malê alîyekî din ê dîyarkirî. Wekî peyva ( Qutabî û Xwendevan ), her yek ser bi alîyekî sîyasîne û ji bo armanca xwe bi kartînin. Peyva ( Fêrxwaz ) jî wekî peyvekî bê alîgire beramberî wan peyvan bi kar anîye.

Peyvên bê alîgir peywendîya bi çi rewşan ve nîne. Lê di hemû şêwaz û deman de dikarin wekî xwe bikar (Husen, 2010, R. 201).

### 2.5.2 Alîgir:

Ew peyvên ku tevlî hest û soza axaftvan dibin. Pêwîste bi alîyê deronîya kesan ve bê girêdan. Ezmuna alîyên kesan jî wisan dike alîyê negatîf û pozîtîf peyda bike. Eger ezmunekî xweş be bandorekî pozîtîf bi ser mivoran de çêdike. Eger ezmunekî nexweş jî

bi bandorekî negatîf li ser mirovan çêdike. Peyv li gorî banadora li ser deronîya mirovan erênî û nerênî radigehîne.

### 2.5.2.1 Alîyê arênî ê deronî

Peyvên erênî di dema bihîstinê de bandorek baş liser gohdarvan çêdike. Gohdarvan hest bi aramî û xweşîyê dike. Berevajî peyvên nerênî yên wekî ( Baş, xweşik, paqij,pere,serkeftin, sebixwe, aşitî û welat....hwkd ).

Peyvên nerênî ew peyvin ku di dema wirjandina hest soz ê beramber, bi armanca ji navbirin û têkşikandina hest û îradeyê ye. Pişt bi wan ve girê dide. Yan jî ew peyvên ku dabeşî bi ser partî û sîyasîyan hatîne kirin. Her yek wekî milkek yê xwe dizanin. Peyvên wekî: ( Beş, Supa, Yekêtîya jinê, Yekêtîya xwendevana û lawan....hwkd ).

Ev peyv li cem hinek alîyan pozîtîfîne û li cem hinek alîyên din jî negatîfîne. Her wiha peyvên wekî ( Malbenda Yekêtî Ciwanan, Jinan, Leşker, Xwendekar ) li cem hinek desthilatan pozîtîfîne û li cem hinek din jî negatîfîne.

### 2.5.2.2 Alîyên nerênî yên deronîyê:

Peyvên  nerênî ew peyvin ku di dema bihîstina wan de bandorekî xirap li ser deronîya kesê beramber çêdike. Wekî ( îslamî, hêrs, aş betal, tundrew, terorîst û şer....hwkd ). Hinek din jî di xaneya alîgir û bê alîgir deye. Di alîyê dijber de bi armanca dillerzîn, êş û şêr bikartê. Wekî çekekê bibandor ji bo roxandina amranc û deronîya beramberbi kartê. Ligel her alîyekê ezmunek ya xweşî û ne xweşîyê heye. Wekî ( 17 şubat, 31 adarê, şêştû şeş, çekdarê hizib, hukmet, Demukorata kartonî....hwkd ).

## 2.6 RÊJEYA BİKARANÎNÊ :

Peyvên deronî bêyî ku alîgir û ne alîgira erênî û nerênî jimarekî zêde dinava xwe de digire. Lê belê di karanîna wan de hemû wekî hev bikarnayên, hinek ji yên din zêdetir bikartê û çalaktirin. Hinek din jî kêmtir bi kartên û radeya sistîyê bi  xwe ve digire. Di vir de em bi başî vê dizanin û balê bi xîn ser wan heyînan.

**2.6.1. Çalakî :**

Ew peyvên deronî ne di rêjeyekî çalak de di alÎyên jîyanê de bi berdewamî bikartên. Di gelek axaftin û nivîsin û peywendîyên civakî demên jîyanê de dewrekî serekî yawan heye. Wekî : (Baş, xirab, xweşik, dilsoz û paqij....hwkd ).

**2.6.1.1 Corên peyvên çalak :**

1- Ew peyvin ku bi xwezayî di ziman de derdikevin. wekî : xweşik, birêz, xweş, diz, gendel...hwkd.

2- Ew peyvin ku bi zagona ziman hatîne çêkirin. ( Darêj û Lêkdayîne )

Darêjên wekî : Nexweş, nerêk, bi soz, neheq, nepak, ne rast, bê mejî, neresen, tirsinok, narewa, nasax, bê nirx, û....hwkd

Lêkdayî : Wekî, dilsoz, paşketin, tund rew, dad perwer, dil sutan, fêr xwaz, yek girtin, yek dest....hwkd

3- Ew peyvên ku bi heyînekê hatîne afirandin yan jî buyerek li piştwan bêyî zagonên zimanî çêbûne.

wekî : ( Reşeba, tuz û ba, dil reş, ziman dirêj, du ru, çav ker....hwkd )

Peyvên çalek hertim li ser lêvan kartên. Hemû mirovek bêyî cîyawazîya temen, ji bo pişre,cih û pêdivîyên xwe yên jîyanê bikartînin. (Hisên R. M., 2010,R. 21)

**2.6.2 Sistî :**

Ew peyvin ku di ferhenga zimanî de heyîna wan heye. Lê belê di karanînê de bi rêjeykî kêm û sist bikartên . Taybetin bi pişeyek yan jî alîyekî dîyar. Hine peyv di ziman de sistî bi xwe ve dibînin wekî :

1- Ew peyvên ku hevbêjin li gel peyva ( Tabo ) hatîne qedexekirin. Ev jî dizivire ser çend sedeman.

a- Hebûna çend zarekê di zimanê kurdî de, bi rêketinê re bûne hevbêjî yek wekî:

Dan (1) danî seks

Dan ( 2 ) didan (Dizeyî E. M., Watasazî u Wişe u Riste, 2014, R. 120).

b- Cudakirina du peyvan yan jî zêdetir dabeşkirina bi ser tiştên cîyawaztir bi şêweyekî rêkketin li gel gotinê da.

Ga (1) Ga cut

Ga ( 2 ) Ga seks (Dizeyî E. M., Watasazî u Wişe u Riste, 2014, R. 120)

2- Hinek din peyvên qedexekirî di ziman de heye. Di her civakekê de komek yê wan peyvan heye. Ew jî qedexekirîne ji ber sedemên ( Şer, tirs, û pîsî ), gotina wan siste û karanîna wan jî kême. Ji ber ku dibe sedemê ku gohdarvan aciz bibe, yan jî wekî kesekî bêşerm û aciz. Wekî : ( Mirin, seletan, tewalet û du can....hwkd ).

3- Yan jî ew peyvên ku paşgir digirin, ( Kird, Ger, Ber, Ker, Ga, Dan ) ji ber ku nêzîkî peyvên tabobûne wateyekî bibandor digire di nava ziman de sistî û kêmî çalake. Ji ber wî jî hinek ji paşgiran di cihê wan de paşgirên din bi kartên.

| | |
|---|---|
| Yarîker | Yarîzan |
| Gulker | Gulkar |
| Xêrker | Xêrkar |
| Rawêjker | Rawêjkar |
| Harîker | Harîkar |
| Dadger | Dadwer |
| Gomanker | Gomandar |

Ji ber pêşketina ziman çendîn peyvên nû beramberî wan peyvan ku paşgir ji wan derdikevin. Dikarin ji bo heman wateyê bi karbên.

| | |
|---|---|
| Tîmarker | Pestra |
| Rawêjker | Betegbîr |
| Maldarîker | Karame, Xanedan |

| | |
|---|---|
| Rawker | Nêçîrwan |
| Pêşeger | Pîşewer |
| Fermanber | Karmend |

4- Hinek ji van peyvan wateyê dide hestên nîştîman perwerî diki, bi serdem û demanre sist dibib. Mînak: Peyvên wekî, ( Azadî xwaz, Kurdayetî....hwkd ). Di dema rejîma behsê de peyvên çalak bûn lê di nihara sist bûne.

## Beşê Sêyem

## Alîyê Deronîyê Di Peyvên Darêjde

### 3.1 PEYVA DARÊJ

Peyv her bi şêweyê sade namîne. Belku di alîyê şêwe û wateyê de goherîn bi serde tê û pêşdikeve. Sedemê vê jî di zivire ser ( Pêwîstîya jîyana civakê, zêdebûna berhem, pêşketina hizrê mirov, pêwîstîya wê bi çêbûn û derketina peyvê nû heye.

Peyên ziman zêde dibin pêşdikevin û goherîn bi ser de tê .: (Meruf, 2014, R. 41). Ji ber vê jî di gelek zimana de, tenê koka azad nikare hemû armancên ziman di peyva ferhengî de pêwîstîyên wê te jî bike. Ji ber vê jî pişt dide çend rêyan ji bo zêdekirina peyva ferhengî di koka azadîyê de:(Xidr, 2010, R. 80).

Yek ji rêyên herî bi berhem pêktê ji ( Rêya dariştin ) ê ku rêyekî herî dîyarin di zimanê kurdî de. Komek peyv têbînîyê di navên sade û watedar de dikin . Ev girek jî ji pêşgir û paşgirekên yan jî her du ji ( Pêşgir û paşgir ) bi hevrene. Ev corên peyvan di zanîsta Peyvsazîya kurdî de bi navê peyva darêjraw tê bi navkirin., (Xerîb, 2012, R. 44).

Peyva darêjraw ew peyva ne sadeye ku di peyvekî sade û zêde de pêkhatîye. Ya zêde jî pêşgir û paşgir her du bi hevrenin. ((Meruf, 2014, R. 56).

Dariştina peyvekê di rêyekî bi biha û nirx de, çêkirina peyvekî nû ya zimane. Ev jî ne taybete di zimanek yan jî gelek zimanan de. Her zimanek jî di karanînê de xwedîyê pêşgir û paşgirên taybet yên xwene. Wekî pirojeyekê têdanîn, kar ji bo berhemanîna ferhengîyan dikin(Wîdson, 2008, R. 72)

Peyvên darêj di koka peyvên sade, watedar û girek pêktên. Ev hemû pêkhateyekî darêjin wekî forkemî nû di koka pêkhateyan de tên. Armanca di darîştinê de pêkhatina formekî nûye her formekî nû jî li ser bingeha peyvekî sade û watedar çêdibe. (Yunis S. T., 2013, R. 32).

### 3.2 Pêkhate :

1- Pêşgir + peyvek sade ( Refîq Şivanî, di pirtûka Peyvsazî a Zimanê Kurdî de ev depoye bi vî awayî dariştîye.(Şiwanî, 2014, R. 210).

Pêşgir + Nav = Bêhiş, bê şerm bê tam.

Pêşgir + Hevalnav = Ne rast, nexweş, nexoş.

Pêşgir + cînav = Herkes, nakes(Şiwanî, 2014, R. 210).

Pêşgir + Qed = Helkewt, Werger

Pêşgir + Regî kirdar = bisud, negor

2- Peyva sade + Paşgir = ( Biheman awayî Dr. Refîq Şiwanî, di pirtûka Wişesazî Zimanî Kurdî de ev desture bi vî awayî dariştîye ). (Şiwanî, 2014, R. 210)

Nav + paşgir = Nanewa, berhemend

Cînavk + pêşgir = xoyî

Hevalnav + Paşgir = baş çake, xirap

Reg ( Kok ) + paşgir = Zana xwêner.

Qed + paşgir = Şikaw mirdu

3- Pêşgir + Peyva sade + paşgir

Pêşgir + reg + paşgir : nabîna, bixor, neker.

Pêşgir + nav + paşgir : hawrêyetî pêşermane.

Pêşgir + hevalnav + paşgir : beciwanî be hêminî

Pêşgir + hevalnav + paşgir : ledurî, bezorî

Pêşgir + qed + paşgir : daxistewe, heldaye.

Pêşgir + çawig + paşgir : ketin, berbunewe.

Hejmarek zêde ya peyvên darêj di rêya ( pêşgir yan paşgir ) de li ser bingeha peya pêşde anîyê derketîye. Ji ber wê jî girekên peyvên darêj di çavê girekên rêzimanî de hejmara wan zêdetire.

Pêşgir yan jî paşgir li gorî xwezaya xwe, peyvan hildibêjêrin û peyvên zarevayê nû çêdikin. Bi vê re jî pêkhateyekî wateyî ya nû tîne di nava ferhengê de (Xoşnaw Ş. H., R. 118).

**3.3 Corên Peyvên Darêj Li gorî Beşên Axaftinê :**

Peyvên darêj li gorî beşên axaftinê dikarin dabeşî ser van coran bibin. ( Navê Darêj, Hevalnav, Darêjraw, Hevalkara darêjraw, Karê darêjraw ).

### 3.3.1 Navê darêjî :

Ew navin ku di peyvên sade de pêşgir yan jî paşirekê çêdikin. Wekî bi vî şêweyê li jêr me dayî dîyarkirin.

_ ( Pêşgiran )

Pêşgira ( Ra, hel ) + reg + regî kar : Navê darêjî . Wekî : Ragir, helwest. (Ocek, 2014, R. 95).

Pêşgira ( Haw,tê ) + navê sade = Navê darêj. Wekî ( Hawjin, hawwilat.... )

- Navê sade + paşgir ( Ew paşgirên ku navê darêj çêdikin, her yek jiwan ji bo armancekê bikartên ).
- Paşgirên wekî : ( Dar, saz, baz, wan bend, çî, ger, ewan, mendêtî, ker ) diçin ser navê sade. Navên darêjî çêdikin. Kar û pişeya kesan dîyar dike wekî :

Dar : Dukandar.

Saz : Didansaz

Baz : Kotirbaz

Ewan : Baxewan

Bend : Nalbend (Seîd, 2013, R. 20).

Çî : Çayçî

Ger : Misger

Mendêtî : Hunermendêtî (Qadir, 2000, R. 63)

Ewa : Nenewa

Ker : Barîker

Baz: Serbaz (Xoşnaw N. , Rêzimanî Kurdî Kurmancî Nawerast û Kurmancî Sero, 2012, R. 40)

- Paşgirên, ( Ayetî, etî, êtî , ênî..... ) , diçin ser navê sade û navê darêj yê wateyî çêdikin. Wekî (Mokiryanî, 1982, R. 14).

Ayetî : Dostayetî

Etî : Pîyawetî

Ênî : Korênî

Êtî : Dizêtî

- Paşgira ( Ela, Ge, Sitan, Dan, Xane, Ga..... ) , diçin ser navê sade û navê darêj jê çêdikin. Bi şêweyekî giştî cihê wê nîşan didin. Mînak :

Elan : Berdelan (Emîn, 1960, R. 85)

Ge : Karge

Dan : Guldan

Ewar : Şiwênewar ( Erdkolnasî )

Xane : Çêştxane ( Resturant, Xwaringeh )

Sitan : Goristan (Ocek, 2014, R. 94)

Zar : Golzar

Car : Nêrgizcar

- Paşgira ( Wile,ole, ulke, îlke, oke, île, le, le, çe, o, ol, çke ) , bi heman awayî diçin ser navê sade û navê darêj jê çêdibin. Ji bo biçûkirinê bikartên û bi armanca sivikirinê yan jî heskirinê bi kartê.

ûle : Mêrûle

Ole : Berxole

ulke : Dasulke

îlke : Çawîlke

île : Engustîle

Le : Birale

Çe : Baxçe

o : Kurdo

ol: Askol

çke : Biçke

oçke : Maloçke

oke : Biznoke

- Hevalkarê sade + Paşgir ( în, ra, ewa....hwkd ).=Navê darêj, mînak :

bin : Binar

în : Pêşîn

ewa : Pêşewa

- Hevalkarê sade + paşgir ( ayetî , êtî, etî, ayî....hwkd )= Navê darêj , mînak :

ayetî : Berzayetî

êtî : Reşêtî

etî : Spîyetî

ayî : Qulayî

- Koka karkirinê + paşgir ( yar, er, ra....hwkd ) = Navê darêj , mînak :

Firoşyar

yar : Kiryar

er : Niwêner

### 3.3.2. Hevalnavê darêjî :

Pêşgir + Navê Sade = Hevalnavê Darêjî

bê : Bêkar (Yildirm, 2013, R. 47)

be : Becerg

- Pêşgir + Hevalnavê sade = Hevalnavê darêjî

ne : Nexweş

na : Nesax (Kurdo, 2013, R. 97)

Hevalnavê sade + Paşgirên ( Kele, îlke, ur, anî, an, o , ele, kîle, île, oke, ele.....hwkd ) = Hevalnavê darêj.

Kele : Reşekele

îlke : Spîlke

ur : Mestur

anî : Nermanî

am : Reqan

o : Pîso (Dizeyî E. M., Wişesazî, 2015, R. 102)

ele : Şêrole

Kîle : Cunkîle

île : Wirdîle

oke :Gêloke

ele : Barîkeşe

-Navê sade + Paşgira ( î ,ane, anî, wer, n, baz, nak, zn....hwkd ) = Heval navê darêj.

î : Hewlêrî

ane : jîrane

anî : Jananî

anî : Şeranî

wer : Bextewer

zn: Diruzin (Xoşnaw N. , Rêzimanî Kurdî Beşekanî Axawti, 2009, R. 45)

n: Şermn

baz : Fêlbaz, Rimbaz (Yildirm, 2013, pR25)

nak : Tirsnak

- Hevalkarê sade + paşgira ( ekî, û , în ) = Hevalnavê darêj.

ekî : Serekî

o : Sero

ber : Berîn

- Regî kar + paşgira ( er, ok ....hwkd ) =Hevalnavê darêj.

er : Nuser

ok : Gerok

- Qed çawig + paşgira ( o, î, e) = Hevalnavê darêj

o : nusto

î : Mirdî

e : Kewte

### 3.3.3 Hevalkarê darêjî:

Navê sade + paşgirên ( ê, ane, ekî , asa, an )

ê : Rojê , Beharê ((Maruf, 2014, R. 101)

ane : Salane

asa : Şêr asaî, kur asaî (Maruf, 2014, R. 101)

ekî : Şewekî (Dizeyî E. M., Wişesazî, 2015, R. 103)

an : Rojan

Pêşgir + Navê Sade = Hevalkarê darêj

be + naz = Benaz

Hevalkarê sade + paşgir = Hevalkarê Darêj

ar : Binar ((Seîd, 2013, R. 23)

Hevalnavê sade + paşgir + Hevalkarê darêj

Mer : ane = Merdane

### 3.3.4 Karê Darêj :

Çend pêşgir û paşgir beşdarî di dariştina karê darêj de dibin. Mînak :

Paşgirên ( da, ra, hel, rû, tê, lê....hwkd ) + Karê sade = Karê darêj.

da : Dabeş , Dadan (Bakır, 2015, R. 41)

ra: Ragirtin

Rû : Rûçun

wer : Werdan

tê : Têkirdin

lê : Lêdan

Karê sade + paşgira ( ewe, ve ) = Karê darêjî

ewe : Xwardnewe

ve : Vexwarin

Pêşgir û paşgir ji bîlî ku peyvên sade di alîyê pêkhatinê de tên gohertin çendîn wateyên nû bi peyvan di bexşin. Wateyekî nû çêdikin . Mînak :

1- Pol Gohertin :

Paşgir yan pêşgir, di zimanê kurdî de hêza wê heye ku peyvekê di şêweyê axafitnê de bi goherin ji bo beşek din. Mînak : ( Bi lêkdana polekê polek din çêdibe ). (Dizeyî E. M., Wişesazî, 2015, R. 129)

a- Nav ji bo hevalnav

Bê + hiş = Bêhiş

Be + Cerg = Becerg

b- Qeda kar ji bo hevalnav

mir + û = Mirdû

c- Hevalnav ji bo nav.

Berz + ayî = Berzayî(Maruf, 2014, pR82)

Xirab + e = Xirabe

d- Rega kar ji bo hevalnav.(Maruf, 2014, R. 89)

ne + bez = Nebez

ne + zan = Nezan

e- Hevalkar ji bo hevalnav.

Pêş + ekî = Pêşekî

Xwar + o = xwaro

f- Hevalkar ji bo nav.

bn + ar = Bnar ((Seîd, 2013, R. 23)

Pêş + ewa = Pêşewa

g- Hevalnav ji bo hevalkar .

jêr + ane = Jêrane

dilêr + ane = Dilêrane

h- Nav ji bo heval kar.

mindal + ane = Mindalane

Şêr + ane = Şêrane

j- Rega kar ji bo nav .

Firoş + yar = Firoşyar

Nus + er = Nuser

2- Pêşgir û paşgir , gelek caran wateya deronî jî bi peyvan di bexşin û bandorê li ser bihayê peyvan jî dike. Mînak :

Pêşgira ( Na, ne, bê, be.... hwkd ) ji peyva, Nahes, na zilam, nezan, bêhiş.

Paşgirên ( ekî, ke, ule, n, tak....hwkd ) peyva ( Daştekî, pîske, rutele, wrgn, xemnak....hwkd ) bandorên xirap dirazînin . Her wiha, paşgira ( ane, dar, î, e, ayetî....hwkd ) , wekî peyvên ( Pîyawane, nazdar, çake, merdayetî....hwkd ).

Alîyên baş dirazîne, ew pêşgir û paşgirên navê wan pê biçûk dikin bingeha dernonîyê hene. Ji ber ku ji bo armanca heskirin û sivikatîyê bi kartên.

3- Çi dema ku peyvên sade pêşgir û paşgirek wergirt, peyvek nû pêktînin û raste rast diçin di nava ferhenga zimanî de.

4- Goherîne zarevayê peyvê : Peyvên sade bi wergirtina pêşgir û paşgiran goherînê bi ser zarevayê binçîneyî de tînin. Mînak :

Gorîn → Gorînewe.

Zarevayê binçîne ( Zarevayê nû ) peyva darêj.(Xerîb, 2012, R. 111)

Pîyaw → pîyawetî. (Qadir, 2000, R. 60)

Zarevayê binçîneyî, Zarevayê nû. ( Peyva darêj )

5- Çêbûna du wateyan yan jî zêdetir ji bo heman pêyvê. Mînak :

Gêl: Bê hiş , Bê mejî, bê aqil, bê aga.

Kor : Nabîna , nêbîn, (Şêxanî, 2009, R. 539)

Reben : Bêmal

6- Lêla Dariştinê : Her çiqas peyva darêj wateya wê eşkerebe,lê belê hinek car peyvên darêj ji ber pêwîstîyên jîyanê wisan dike ( Firewateyî hevbêj ) çêbike. Lîl jî çêbike û di karanînê de eve lîle namîne. Mînak :

( Xwardnewe ) peyvekî darêje ji ( Xwardn + ewe ) pêkhatîye. Di zimanê kurdî ji bo xwarina made û tiştên şil bi kartê. Wekî ;( Ça,, Şerbet, naw.... hwkd ). Lê belê di hevoka ( Nerîman Xoşnaw ) de, di vir de armanca wê ewe ku nerîman xwarina kelayî naxwe.

Yan hikeft : 1- ( Ayraz ), yan .

5- Bi wateya ( Ji tiştekî ketin ) tê.(Qadir, 2000, R. 60)

7- Pêşgir û paşgir wekî amêrekî eşkere ya peyvan tê danîn. Dema em têxin ser peyvê tarî yên paş dariştina corê ronî nîşan dide. Mînak :

Şîn : Peyvekî tarîye (Dizeyî E. M., Watasazî u Wieşe u Riste, 2014, R. 39)

Şênayî : Peyvekî ronîye, ji ber ku dîyare ji çi peyvê hatîye çêkirin.

Şîn + ayî = Şînayî

## 3.4 SEDEMÊN BİNGEHA DERONÎYÊ :

Hejmarek zêde peyvên darêj yên zimanê kurdî xwe dî bingehek ya deronîyê ne. Sedemê çêbûna vê bingehê bi başî yan jî xirabî, ji ber rola ( pêşgir û paşgire ). Demaku pêşgir û paşgir peyvekî darêj çêdikin, ji bilî ku di alîyê pêkhatinê de tên gohertin wateykî nu çêdikin. Di heman demê wateykî deronî jî pê dibexşin. Di vir de emê wan ( Pêşgir û paşgiran ) dîyar bikîn ku rolê wan di çêbûna bingeha deronîya peyvên darêj de heye.

1- Ew ( Pêşgir û paşgirên ) diçin ser nav alîyekî deronî bi peyvê di bexşin.

- Pêşgira ( Haw ) beşdarî di çêbûna alîyê erînî dike. Wekî :

Hevjîn,(Maruf, 2014, R. 83)

Hawsoz

Hawdeng

Hawrê

Hawbîr (Hesen Ş. M., 2007, R. 70)

Hawziman

- Ew paşgirên ( ayetî, etî....hwkd ) beşdarî di çêbûna navê wateyî de dikin û alîyê deronîyek baş dibexşin. Wekî :

etî : Pîyawetî

yetî : Azayetî

- Paşgira ( ayetî, î, e....hwkd ) beşdarî di çêkirina navên darêj dikin û bandorekî du alîjî heye.

Mînak :

| | |
|---|---|
| Bandorekî baş | Dostayetî, Azadî, Çake |
| Bandorek xirab | Dijminayetî, Kwêrî, xirabe |

- Paşgira ( a ) bi heman awayî bandorekî du alî heye. Dema di peyvên wekî : ( Zana û Dana....hwkd ) bandorekê çêdikin, bandorekî baş dirazînin. Dema beşdarî di peyvên wekî : ( Koştar, mirdar, girêftar....hwkd ) dikin, bandorekî xirab çêdikin.

- Ew paşgirên ku taybetin ji bo biçûk kirina nav û armanca heskirin û sivikirinê bi kartên. Bi karanîna wan re jî alîyên baş û xirab jî werdigirin.

Mînak : ( Wele, o, wek, ocge....hwkd ) beşdarî di navê ( Kîjole , Şêro, Birale, Maloke, Maloçke....hwkd ).

- Ew paşgirên ku wateya pişeyî çêdikin, wekî : ( ewan, bende, ker, çî, çêtî, ger, ewa....hwkd ) alîyekî xirap yên deronîyê di bexşînin. Wekî : ( Naşewan, Nabend, Nasnger, Barîker, Saxteçêtî ).

2- Ew pêşgir û paşgirênku taybetin ji bo çêkirina hevalnavên darêj, alîyê deronîyê dibexşin. Wekî : Paşgira ( an, ekî, n, nak,....hwkd ) Beşdarî di çêbûna wan hevalnavan dikin. Mînak : ( Jananî, xîlekî, tukin, xemnak.... hwkd ).

- Paşgira ( o, ol, ole , kele....hwkd ) beşdarî di çêkirina wan hevalnavên darêj dikin ku di hevalnavên sade jî çêdikin. Mînak : ( Pîso, Şirol, Şirole, Gêloke, Reşkele...hwkd ). Bandorekî bi lez a xirab bi peyvan di bexşin.

- Ew paşgirên ku diçin ser navê wateyî û hevalnavê darêj çêdikin, wekî : ( bar, tak....hwkd ) beşdarî di çêkirina peyva ( Sitembar , Xemnak ....hwkd ) dike. Wateyekî xirap jî çêdike.

- Paşgira ( Ok ) li gel koka kar hevalnavên darêj yên wekî : ( Lerzok, girînok, tirsînok....hwkd ) çêdike û alîyê xirab jî pêdibexşe.

- Pêşgira ( Na ) li gel hevalnavekî sade hevalnavekî darêj çêdike. Alîyê xirab jî dibexşîne. Mînak :

  ( Na ) naxoş, narêk, napak....hwkd

- Pêşgira ( Bê ) bi heman awayî beşdarî di peyvên wekî ( Bêhiş, bêkarmet, bêşerm..... ) dike û alîyek xirap yê wan heye.

- Pêşgira ( b ) di çêkirina hevalnavê darêj de rolê du alî çêdike. Dikarin beşdarîyê bikin di çêkirina hevalnavê darêja nerînê û hevalnava darêja erênî wekî :

  ( b ) bikoj alîyê xirab

  ( b ) biwêr alîyê baş

- Pêşgira ( ne ) bi heman şêwe beşdarî di çêkirina hevalnavê darêja erînî û nerênî de dike. Mînak:

  ( ne ) nexweş, nefam, nezan ( alîyê xirab )

  ( ne ) nemir, nebez, netirs, neberd ( alîyê baş )

3- Paşgira ( ane ) dikare beşdarî di çêkirina hevalkarê darêj û alîyê wê ê baş û xirab de bike. Mînak :

  ( ane ) dilêrane, şêrane ( alîyê baş )

  ( ane ) Şêtane ( alîyê xirab )

4- Ew pêşgir û paşgirên ku beşdarî di bûyerek a karê darêj de dikin, wateyekî deronî bi peyvê dibexşin. Wekî : Pêşgirên ( têk, ro, lê, ra, têwe, hel ) beşdarî di karê darêj yên wekî ( Têkçûn, roçûn, lêqewman, ragwast, têweglan, helkutan ) dikin. Paşgirên (

pêk, rêk , ra....hwkd ) beşdarî di peyvan ( Pêkhatin, rêkkeftin, raperîn ) dikin û alîyekî bi bandor yên peyvên darêjin.

## 3.5 BANDORA PEYVÊN DARÊJÎ Dİ ÇAVLÊKİRİNA ALÎYÊ DERONÎ DE :

Bi karanîna ziman re soz nîyetekî baş yan xirab derdikeve. Wisan bi me dike ku em di bandora peyvan de hest bi silametîyê bikîn. Em dikarin li ser rêya qerebûna wan peyvan bi dest bînin. Wateyek guncaw a wan heye, di karanîna peyvê de heman wateya wirjandine.

Bandora wan peyvan ji alîyê xelkê ve çawe bi karanîna wane. Peywendîya peyvan wisan lê dike hinek bi hinekdin re peyvên ast nizim û wateya nizim bi bexşîne.

Çavlêkirina hilbijartina peyvan herî zêde li ser hizir û bawerîya civakê di sekine. Her civakek jî xwe dî zagonên xwe ne. ( Axaftvan pabenda pîvanê nêye û wan peywendîyan di wê rêyê de rêkdixin ).(Osman, Karabunî Ziman Le Peywendye Komelayetiyekanda, 2008, R. 42)

Pabend bûna van pîvanan bandorekî ( Nerênî ) û zivirandina bandora ( erênî ) li ser peywendîyê mirovan civakê çêdike. Gofman, dibêje : Ew kesê di rêya gotinên xwe de, aramîya derdor têkdaye, ew kese di peywendîyan de ne serkeftîye. Bi vê re zîyanê dide xwe û derdora xwe. Encama wê xirab dib (Hidsin, 1987, R. 197)

Alîyê erênî û nerênîya peyvên birî di civakê de serî hildidin. Di heman demê de civak biryarê li ser didin. Ka rê ji çi peyvê re hatîye dayîn yan jî ne hatîye dayîn. Li gorî Findrîs , civak bi serbestî soz û ture, reftarên kesan vedike û di qalibekê de dirêje. Her kesê xwe jê bide paş rube ruyê sezayê civakê tê. Siviktirîn jî henek pêkirine. (Dizeyî E. M., Pêkhatey Axawtin Le Zarî Hewlêr, 1999, R. 168). Her civakek komek zagonên xwe heye. Li ser hizir, bawerî û tureya bingehîn cudaye ji civakên din. Girîngîyê bi peywendîya civakî, başkirina xelkê, komkirina dilê xelkê, belavkirîna heskirin û aşitîyê dide. Her wiha dixwazin xwe ji peyven aciz bidin baş .

Bandora gotina peyvan pîlanekê pêve girêdide, ji bo cih kirina hinek bi berhestkirina hinekî dindi jîyanê de. Biryardayîna xelkê û hilbijartina peyvan vê ji bo wan derdixe holê. Gelik tişt li derdora me hene ku du navê wan heye. Hinek ji wan wateyekî negatîfîn lê wateyekî pozîtîf ya wan heye. ( Hilbijartin û karanîna peyvan di ziman de ji bo gotina hizir û fikran ji bo gohdarvane.(Molîne, 1999, R. 243).

Mînak : Peyva ( Nebîn ) û ( Kor ) her du jî wateya kesê nebîn radigehîne. Gotina her duyan jî çavlêkirina fikir û hizirkirna kesê axaftvane. ( Ebdulwahid Mişrî, 2015 : 100). Her yek ji wan ji bo armancekî dîyar tênhilbijartin. Peyva ( Nabîne ) beram berî kesekî bandorekî baş û hestekî aram dide deronîya gohdarvan. Peyvan ( kor ) di gotinê de dibe ku êşekî bi kes bibexşîne. Bandorekî xirab li ser çêbike.

Axaftvan jî di nava civakê de wekî kesekî bê rêz tê naskirin. Her wiha yek wate û yek armancê radigehînin. Her yek ji wan badorek ya xwe heye li ser gohdarvan. Bi heman awayî jî kesayetîya kes û helwesta wî jî dîyar dike. ( Nerast ) hestekî baş tê deye . Dema mirov dibîhîse rastî êş û bê aramîyê nayê. Lê belê berevajî wê peyva ( Derew ) bandroekî negatîfî çêdike. Belku di gelek caran de jî pirsgirêka civakî jî tê de derbikeve. ( Li gorî rewşa kesan û ezmuna radeya têgehiştinê fêmkirina wateya peyvê tê gohertin. Ji ber ku ev cîyawazîya di navbera kes ji bo kesê din deye.(Hemdan, 1982, R. 175).

Gotina peyvan rêjeya rewşenbîrî û têgehiştina kesan dîyar dike. Hest, soz, hizir, bawerî, hilçûn û xwestek tê de têdîtin . Helwesta kesayetî jî eşkere dike. Rêyeke ji bo naskirin û nîşankirina axaftvan. Her wiha hilbijardina peyvek ji van peyvên hevwateyî yên wekî :

( Xwendevan, qutabî, fêrxwaz û telebe ) yan jî ( Şil û siqet ), ( ker û nebihist ) ne bê armancin û cihê balkêşîyê ne. Ji ber ku hilbijartina her yek jiwan nîşaneke ji bo çavlêkirinahelwest hizir bawerîya kesayetîya kesan û wateyê dide bawerîya mirovan. . Her wiha karê çavlêkirina alîyê deronî ( Peyvek di nava peyvên hevwate de hildibijêre, ev hilbijartinê jî bi goherîna peyvekî guncaw be li gel civakê

Mirov her çiqas xwedî hiş û zana be, ew qas jî di gotina peyvan de xwedî bibandore. Ji ber ku mirov dikare bi peyvekî xirab kesayetîya kesekî bi ruxîne. Mînak :

Peyva wekî ( Derzî Kîmyawî ) ku nexweşên ( Penceşêrê ) bikartîne. Her çiqas kesek ev nexweşî hebe, lê dema navanîna (Derzîya kêmyayî ) zêdetir dibin sedemê êşan. Gelek caran jî her ev nexweşîyejî ne bû bi xeletî derdikeve. Lê belê di encama nav anîna vê peyvê de dibe sedemê mirina kesî. Eger peyva ( Rizgarkirin ) bikar bîne corekî hestên baş û geşbînîyê di bexşîne.

Çavlêkirina alîyê deronî di rêha hilbijartina peyvên hevwate tên. Di wateyên hişîde, û di wateyên bi bandor de cîyawazin. Wekî van destoran

| Sitonî (1) | Sitonî ( 2 ) |
|---|---|
| Xirab | Nebaş, ne şîyaw(Şêxanî, 2009, R. 639) |
| Bêhiş | Bê agahî, ne hişya (Şêxanî, 2009, R. 527) |
| Xeşîm | Ne şareza, ne pispor(Şêxanî, 2009, R. 527) |
| Nefam | Ne zîrek |
| Dilteng | Asû |
| Moçexwer | Karmend |
| Xemdar | Bê keyf |
| Reben | Bêmal |
| Gêl | Sakar |
| Bebext | Bextewe(Hrjar, 1388, R. 68) |
| Naşirîn | Na zerîf |
| Pîs | Napoxt |
| Xemgîn | Naşad |
| Dujmin | Ne dost |
| Kafir | Bê bawer |
| Ajaweçî | Be kêşe ( Bi pirsgirêk ) |

| | |
|---|---|
| Bêgane | Lawekî |
| Tirsinok | Bê hinav û ne wêrek |
| Şeranî | Ne guncaw |
| Dirozin | Ne rast |
| Diz | Ne pak |
| Bê xîret | Bê desthilat |
| Rezîl | Bigir |
| Xirab | Ne hemwar |
| Xizmetkar | Pêşkar |
| Nakes beçe | Naneçîb |
| Bê esil û fesil | Nanecîb |
| Tembel | Karneker |
| Bê kes | Bê arîkar |
| Ocax kor | Bê zarok |
| Ajaweçî | Nearam |
| Çenebaz | Be qise ( gotin zan ) |
| Helewer | Be qise |
| Zalim | Bê bezayî |
| Fêlbaz | Be azar |
| Canbaz | Be azar |

## 3. 6 BİNGEHA DERONÎYAN :

Bingeha deronîyê bandora rewşa deronîya ( Axaftvane ) . Gelek caran ezmun û zanyarîyên xwestekên kes têde beşdar dike. Gelek caran jî sinorê civakê têde dizivire û di civakê de hevbeş dibin. Zimanê du alî heye ( Kes û Civak ) pêşbînîya her yek ji wan bêyî ya din çênabe.(Xazî, 1984, R. 20). Her ji ber vê jî çavkanîya bingeha deronîya du alîyan digire. Wekî :

### 3.6.1 Hilkolana Kesî :

Mirov di jîyana rojane de rastî gelek peyvan tên. Hinek caran li gorî wan xweşe û hinek caran jî ne xweşe.(Dizeyî E. M., Rehendî Deronî Le Biwarî Rageyandin, 2005, p. 83) . Sedemê vê jî ji bo wê dizivire ku bingeha deronîyê peyvek heye başe yan xirabe.

Bingeha deronîyê nakevin dibin ( Rastî û nerastî ) de. Ji ber ku fikrekî şexsîye ne şerte ku rêketina kesek din li ser be(Dizeyî E. M., Rehendî Derunî Le Biwarî Rageyandin, 2005, R. 83)Bingeha deronîyan jêr bingeha hest û soz an de encam dide. Axaftvan bi xwe xwedîyê hest û fikirînê ye. Wekî zimanê helbestê zimanê rijandina hestên kesîye. Her wiha zimanê helbestê bandora nava mirovana. Ew peyvên ku di wêje û giştî helbestan de derdikevin. Di çarçuveyekî xwaze, endîşe li ser peyvên asayî yan peyvên ferhengî derdikeve. Bi taybetî jî helbestvan bi awayekî balkêş û awazdêr rih dide peyvan. Livîn û wateyên nû pê dibexşîne.(Dizeyî E. M., Şêwaz û Piragmatîk, 2012, R. 47)

. Helbestvan peyvên bar giran ji bo hest û sozan hildibijêre. Ji bo wê armancê ye ku bandorê li ser kesê beramber bike.(Yaqubî, 2001, R. 26) Her wiha peyvên deronî çavkanîya bingeha pêkhateya wêjeyê ye. Amraza destê nivîskar û helbestvane, bi taybetî jî helbestên herî bilind zimanê hest û soza kesîye.(Fezil, 1987, R. 378). Ji ber wê jî em dibînin hest û soz wêneyên zêde pêktênin. Ji bo bandora hilkolîna wêneyê endîşeyê. Ji soz û resentîya wê hilkolaye(Dizeyî E. M., Şêwaz û Piragmatîk, 2012, R. 30):.

### 3.6.2 Hilkolîna civakî :

Civak, bişêweyekî giştî beşdarî di bandora bingeha deronîyê de dike. Pêwîste bi ezmuna ( nivîskar ) û civakê bikarbîne. Di çarçûveya civakê yan jî neteweyê de kardike. Mînak : Ji alîyê gelê kurd ve wesifkirina rejîma behs bi van peyvan. ( Têkdan, Nehez, Dirinde, Enfalçî û Faşist....)

Hilkolînekî û hestekî beramberî vê rejîmê derdixe. Ew jî ji bo wê ye kû ezmuna wê girtîye ku ew jî li gel de hebû. Gelek caran ramanên civakê ji bo beramber hinek kar û pişeyên peywendîya wan bi tureya civakê û çanda civakê re heye. Dibin sedemê ku bingehekî deronî werbigirn. Wekî,pişeyên ( Kotirbaz, Nanger, Asinger, Zêrînger....hwkd).Ramanên civakê beramberî tişt û buyeran dibin çavkanîya bingeha deronîyan. Em dikarin bêjin hizir û fikrê civakê wisan dike, ew kese peyvên bûyerê bibe xaneya bingehê.

## 3.7 ARMANCA GOTİNÊ :

### 3.7.1 Hestên gotinê :

Yek ji armancên (Bêjer ) karanîna peyvên deronîne. ( Bêjer ) dibêje û beramber bi ( Kes tişt, buyer, û derdor ). Ka ev bi awayekî rast be yan jÎ xwedîyê wê hestîyê hindirê kes razîne. ((Dizeyî E. M., Rehendî Deronî Le Biwarî Rageyandin, 2005, R. 200). Bingeha nîşandana hestên ( Bêjer ), Martî wekî ( Axaftinê di nava dil ) de binav kirîyê . ((Dizeyî E. M., Şêwaz û Piragmatîk, 2012, R. 25) . Gelek caran jî ne ji bo aramnca ji hev fêmkirinê ye. Belku ji bo bandorkirina li ser wergire. Seîd Tufîq di pirtûka ( Alxbre Alcmalye ) de hest ji bo du coran dabeş kirîye. (Tufîq, 1992, R. 416).

1- Hestên Resen: Bandorekî a rewşa deronîya ( Bêjere ) ku bandorekî dîyar û hilçîna raste rast a dil û wijdana hilkolîna armanca gotina hestê ye. Ev hest û gotinejî xwesteka ( Bêjer ) di çespîne.(Elbeka, 1988, R. 8).

2- Hestên Xwestek : ( Bêjer ) divir de wisan ji  xwe bawere ku xwedîyê wê hestane. Lê belê di rastîyê de bi xwe beşdarî rastîya van corên hestan de nale. Belku tenê ji bo armanca rijandinê ye.

Dema mirov hestên xwe beramberî kes, tişt, bûyer û derdor de dibêje, bandora hestan ji bo çûyî di gehîne.Ew jî dibe du cor :

### 3.7.1.1 Hest gotina bi baş:

Nivîskar yan jî bêjer, dema tiştek yan jî bûyerek bi dilê wî be, hest û helwestên xwe bi başî dibêje. Wekî gelê kurd hestekî baş beramberî ( Raperînê ) li dijê dijiminê xwe rejîma behsê. Nirxandina ( Bêjer ) beramberî bûyer, kes û tiştekê hestên xwe dibêje bi başî nirx û bandora xwe werdigire. Gelek caran hest gotin beramberî kes dibin rêvebir, Kesên şoreşger jî bi ( Xebatkar û Fedayî ) bi nav dibin.

### 3.7.1.2 Hest gotina bi xirabî :

Dema ku nivîskar bûyerek yan jî helwestek ne bi dilê wî be, wêdemê hestên xirab dibêje.(Dizeyî E. M., Rehendî Deronî Le Biwarî Rageyandin, 2005, R. 208). Wekî : Hestên kesê kurd û civaka kurd bi giştî beramberî rejîma behsa ( Dagirker û çete ). Di giştî Kurdistanê de wekî tewanbar, nayê heskirin û dirinde tê wesifkirin.

### 3.7.2 Hest rijandin :

Nivîskar di vir de dixwaze hestên gohdarvan birêjîn. Bi armanca çêkirina hest û helwesta xwestekekî taybet a wergir(Dizeyî E. M., Rehendî Deronî Le Biwarî Rageyandin, 2005, R. 214). Yan jî di rêya wan pêwîstîyan de di sekinin, kes yan jî civak pêwîstîya wan pê heye. Mînak : Gelê kurd di serdema rejîmê de pêşî çend salan

( Azadî, Serxwebûn…. hwkd ) pêwîstîyên girîng dijimartin.Ew peyvane bandorekî berçav li ser gelê kurd kirîye .

Di roja me ya îro de jî ( Tebayî, rêkkeftin, hevsoz, aşitî, ….hwkd ) wekî pêwîstîyekê a vê serdemê tê zanîn. Bi gotina van peyvan re bandorekî li ser hest û helwestan çêdike. Rijandin jÎ herî zêde ji bo goherîna pêşkêşîyê dibe. Berjengekî ne di cih de ye di nava civak û kesan de pêwîstî bi komek hizir û fikrên tureyîne. Hest rijandin jî di be du cor :

### 3.7.2.1 Hest rijandina Ji bo civakê bi sud :

Di vî corê pêşkêşîyê de ji bo berjewendîya giştî û xizmetkirina gel û netewê ye. Wekî, gelek alîyên jîyanê , perwede nîştîman perwerî, ayîn û karên xwendevanan. Ev corê rijandinê di berjewendîya civakê de ye li pişt hestên neteweyî û niştîmanî de ye. Ji bo rêzkirina gel di dema nakukîyê de gotarên sîstemdaran de derdikevin . Wekî . ( Aşitî, Sazan, Jîyana Aşitî ) rijandinekî başe . Piştgirîya avakirina pêwîstîyên beramberî kes yan çîn, civakê giştî wekî desthilat dare. Kar dikin ji bo ( Yeksanî ) ne hiştina ( Neyeksanî ) ne edaletîyê di nava cibakê de . Xizmetkirina baj û welat ji bo ( Avakirinê ), dayîna paş ya kesên ( Ne rast ) û ( Ne paqij ) di nava dam û dezgayên welat de.

### 3.7.2.2 Hest rijandin Ji bo sudê Şexsî ( kesî ) :

Rijandina hestan ji bo sudê xwazan kar dike. Nivîskar bi xwe ne xwedîyê van hestane, belku hizrê wê jî nebe.(Dizeyî E. M., Rehendî Deronî Le Biwarî Rageyandin, 2005, R. 218). Lê belê li ser armanca rijandina kesî xem xwarê ( wergir ) datîne. Ev jî herî zêde di piropaxandaya şerê deronî û propaxandaya bazirgan, ramyarî û ragihandinê de derdikeve holê. Nivîskar, wek çekekî ji bo derxistina armancan bikartîne. Piştgirîya çendîn şêwazên ne rewa dike ji bo balkêşîya wergir. Daku helwestan werbigire. Bi vê re jî pêwîste fikran werbigire ne razîkirin. (Zhran, 1981, R. 41). Nivîskardi vê rijandinê de li pey xala bihêz digere.

## 3.8 ÇAVLÊKİRİNA ALÎYÊ DERONÎ :

### 3.8.1 Bi Başî :

Hinek peyv di zimanê kurdî de hene bandorê li ser hestên mirovan û taybet wan navên ku geşbînîyê radigehîne dike. Yan jî ew navên ku civak ezmûn li gel wan heye. Hinek ji wan navan xwedîyê helwest û nirxên dîyarkirîne. ( (Malik, 1980, R. 314). Wateya peyvên deronî bi wateya hinel tişt û bûyer....hwkd dil xweş û asude dibin. ( (Dizeyî E. M., Zimanewanî Derunî, 2014, R. 38)38 ). Ev jî bandorekî baş li ser deronîya kesan çêdike. Bi wê wateyê ku ezmûna kes li gel bûyeran rêjeya bandorîya peyvan dîyar

dike.(Hesen R. S., Taybetmendîy Zimanekan Wişe û riste Le Şerî Derunîda, 2014, R. 47)Mînak :

( Raperî ) bandorekî baş li ser hest û derona civaka kurd çêdike. Bi bihîstina wê re hest dilxweş dike. Ji ber ku ji bo wê ezmûnê dizivire. Her wiha peyva ( Hilbijartin ) bandorekî baş heye. Ji ber ku bi rojekî dîrokî tê danîn, yekem car gelê kurd piştî vê pirojeyê bûye xwedîyê mayînê. Her wiha ew peyvên ku geşbînîyê nîşan didin. Wekî ( Bextîyar, Şahêz, Şasiwar, Bihêz, Nebez, Bextewer, Pêşewa û Rêber....hwkd ). Bandorekî baş ya wan heye.

Ji ber bandora ayîna îslamê li ser civaka kurd wisan kirîye ku peyvên wekî : ( Çake, Beemek, Lêborîn, Bawerdar, Harîkar, Asankar, Bexşinde, Be teqawa û Be bezeyî....hwkd ). Bandorekî baş li ser hestên kesan hebe . Heya niha jî gelek ji navê kurdan yên di demê ayîna îslamê de ne . Navê navdarên îslamê û bûyer û serpêhatîyên ayînê di zivire. ( (Hisên R. M., 2010, R. 39). Mînak : ( Beheşt....hwkd ) Bûyerên dîrokî û hizir fikrên bibandor li ser kestên kesên civakê çêdike.

### 3.8.2 Bi Xirab :

Ev alîyê deronîyê jî bi wateya hinek ( tişt ,kes û bûyeran ) re li gorî ezmunan mirov pê dilgiran ne asude dibin. Ji ber ku ezmûnên tehil û nexweş li gel wan heye. Ji ber wê ye gohdarvan bi bihîstina wan re bandorekî xirap li ser hest û derona wan çêdike. Mînak : Eger peyva ( Kotirbaz ) ji kesekî re bê gotin hestên wî ne asude dike û pê dilgiran dibe. Ji ber ku ev peyve di civaka kurde wekî berjengekî xerîb û xirap tê naskirin. Ji ber wê jî bandorekî xirap heye. Eger peyva ( Nanker ) ji kesekê re bê gotin bi heman şêwe bandorekî xirap çêdike. Ji ber ku di nava civaka kurd de biwateya xizmetkirina xelkê tê. Ew peyvên ku reşbînîyê nîşan dide bandorekî xirap ya wan heye. Wekî : ( Xemgîn, Bê kes û xembar, Wêran, Bêbeş.... hwkd ).

## ENCAM:

1- Wateya peyvan nirx û bihayê xwe heye. Di her rewşekê de û di her civakekê de core hêzekê pê dibexşîne. Wateyekî cêgir jî nîne.

2- Bingeha deronîyan, di zimanê kurdî de bandora hestên kes û gotinên civaka kurdî, wateyê di de hest û helwestên civakî.

3- Ew peyvên ku xwedîyê bingeha deronîyê ye di gelek alîyên jîyanê de wekî : (Perwerde, Sîyasî, Ayîn, Şer, Deronî, Wêjeyî û Ragihandin....hwkd ) rolekî serekî dibînin. Wekî çekekî bi bandor tê danîn ji derxistina armancan.

4- Ew peyvên ku bingeha deronîyê tê dene, axaftvan ji bo armanca hest soz û rijandinê ber bi wan ve diçe.

5- Di gelek alîyan de peyvên ( Erênî ) rol dibînin. Lê belê di şerê deronîyê de peyvên (Nerênî ) zêdetir bandora wan heye.

6- Sedemê bingeha deronîya peyvên darêjî ( Pêşgir û Paşgir ) an, her beşekî axaftin komekî taybet ya xwe heye.

7- Ji ber sedemên civakî û deronî hinek ji paşgiran ji ber nêzîkbûna wan a peyva ( Tabo) qedexekirî, di dema karanînê de paşgirek din bikartînin. Di karanîna wan de sistî Di nava her civakekê de danîna hêmayan a ji bo her tiştekî cudaye. Ew jî bi tîpa rêketina civakê tê dayîn kêmî û çalakî derdikevin.

8- Hejmarek zêde ji peyvên darêj rolekî berçav di girin di çavlêkirina alîyê deronîyê

9- Mirov hêmayê wekî sembolekî bi kartîne. Cudakirina tiştan ji derdore, ew jî lGi ser xwesteka mirovane

10- Di nava her civakekê de danîna hêmayan a ji bo her tiştekî cudaye. Ew jî bi tîpa rêketina civakê tê dayîn

11- Lêkdana wateya peyvan, dîyarkirin û rêxistina wateyan di keve sitûyê civakê

21-11- Ji alîyên kesên civakê ve gotina peyvan, cîyawazîyek gelek heye di barmberî bûyer, tişt û têgeh de

# ÇAVKANÎ:

Ahmed, î. (1989). Elitcah elwezifi u dewrha fi eltehlil elluxe. *Alm Elfkr* , 77.

Aladrîs, Y. B. (1999). *Eslîhe Elherb Elnefsîye-Elsaihat u Xesl Eldemax u Tesewr Elwîqate minha.* Ryaz: (Risale Macster).

Alebîdî, R. E. (2003). *Mebahs fî Ilm Elluxe u Ellisaniyat.* Bexdad.

Alemdanî, H. M. (2012). *Eldîaye Elsiyasîte.* Elurdn-eman: Dar isame.

Almtlbî, x. (1986). fî Elilm Elluxe.

Alxulî, M. E. (1987). *Eleswat Elluxewiye.* Ryaz: Mektebet Elxerici.

Alzbîdî, K. E. (1998). *Ilm Elnfs Eleskeri.* Birut: Wezaret Eltelim Elali.

Bakır, A. (2015). *Rêziman û Peyvsazî Kurmancî.* Çapa Yekem.

Celal, B. (1997). Ristê Wişey Agrawî. *Raman* , 166.

Cîro, P. (1957). *Elislub u Elislubiye.* (M. Eyas, Trans.) Bîrut: Merkez Elinma u Elqewmi.

Cooper, D. E. (1973). *Philosophy and the Nature of Language.*

Dawid, M. M. (2003). *Elluxe u Elsiyase fi Alm mabede 11 Sibtember.* Elqahire: Dar xerib.

Dizeyî, E. M. (1999). *Pêkhatey Axawtin Le Zarî Hewlêr.* Hewlêr: ( Namey Master ),Kolêjî Adab, ZankoySelahedîn.

Dizeyî, E. M. (2005). *Rehendî Deronî Le Biwarî Rageyandin.* Hewlêr.

Dizeyî, E. M. (2012). *Şêwaz û Piragmatîk.* Hewlêr.

Dizeyi, E. M. (2014). *Watasazi u Wise u Riste.* Hewler.

Dizeyî, E. M. (2009). *Wataszî Çend Lêkolîneweyekî Sîmantîkî û Piragmatîk.* Xanî,: Xanî,.

Dizeyi, E. M. (2004). *Watay Kariger leBiwari Ragehandin.* Hewler: (Namey Diktora),Koleji Adab,Zankoy Selahedin.

Adab,Zankoy Selahedin.

Dizeyî, E. M. (2015). *Wişesazî.* Hewlêr.

Dizeyi, E. M. (2015). *Zanisti Simantik.* Hewler.

Dizeyiî, E. M. (2014). *Zimanewani Deruni.* Hewler.

Mistefa, M. F. (2011). *Jiyan u Berhemi Ziwer.* Hewler.

Ebdulcelîl, E. (2006). *Elmejem Elwezifi Limeqays Eledewat Elnehwiye u Elserfiye.* Eman: Dar Elsefa u Elnesir.

Ebdulrehaman Şerîf Kendî, (. ). (1388). *Ferhengî Henbane Borîne.* Tehran: Mctemeh Ferhengî Siroşt.

Ebdulrehman, Ş. O. (2008). *Karbûnî Ziman Le Peywendî Komalayetîyekan da.* Bexdad: ( Namey Master), Kolêjî Perwerde ( İbn Ruşid ).

Ebdulwahid Mişrî, û. Ş. (2013). In *Zimanewani Siyasi.* Hewler.

Elbeka, M. K. (1988). *Elsir Elerebi inde Nihayat Elqerin Elisrin,Elislubiye Beyne Eltuas u Elmasere.* Bexdad.

Elhemdanî, a. M. (2012). *Eldîaye Elsîyasyeî.* Elurdun: DarIsame.

Elî, C. M. (1982). *Idyom Le Zimani Kurdi da.* Bexda: Dezgeya Rewsendiri Bilawkirdnewey Kurdi.

Elî, F. M. (1998). *Idyom le Zimani Kurdi.* Hewler: (Namey Diktora),Koleji Adab,Zankoy Silahedin.

Elî, M. M. (2010). *Seretayek bo Zanistekani Watasazi u Pragmatik.* (N. E. Xosnaw, Trans.) Hewler: Rojhelat.

Elî, N. E. (1960). *Rêzimanî Kurdî.* Silêmanî: Kameran, Bergî Yeke.

Elî, T. H. (2014). *Zanisti Ziman u Zimani Kurdi.* Hewler: Rojhelat.

Eluer, M. (1994). Elitcahat Ellsaniye Elmasere u dewrha fi dirasat elislubiye. *Aim Elfkr* , 158.

Elwafi, E. (2000). *Zanisti Ziman.* (D. Eziz, Trans.) Hewler.

Elxmaş, S. S. (1328). *Elmehcem u Elm Eldilale.*

Emîn, N. A. (1960). *Rêzimanî Kurdî.* Semani: Kammmeran.

Emin, Y. N. (2009). *Zimannasi* , 128.

Eslam, E. (1980). *Mefhum Elmeina Dirase Tehliliye.* Kwit.

Eumer, A. M. (1982). *Elm Eldilale.* Kuwet: Dar Elirube..

Eumer, E. M. (1982). *Ilm Eldilale.* Elkwit: Mektebe Dar Elirubr .

Ewad, C. E. (1984). *Elerb Elnefsîye u Saihat Elerb.* Bexdad: Merkez Elehdad u Tetwir Elseqafi.

Eziz Hino Dawid, N. H. (1990). Ilm Elnefis Elşexsiye. Elmusil: Tehlim Elali.

Ezîz, R. Î. (2008). *Nawnan u Hest Le Zimanei Kurdi da.* Hewler: (Namei Mastre) Koleji Ziman,Zankoy Selahedin.

Ferhadi, S. E. (2014). Watai Wise Lenewan didi Ferdinand di Soser u Haliday. *Elistdz* , 471.

Feteh, M. M. (2011). Hewler: Rojhelat.

Feteh, P. D. (2010). *Lekolinewe Zimanewaiyekan.* Hewler: Rojhelat.

Fezil, S. (1987). *Nezeryat Elbinaiye Fi Elneqid Eledebi.* Bexdad: El-Tebhe Elsalise.

Hemdan, M. (1982). *Elluxe u Ilim Elnefis.* Elmusil.

Hesen, R. S. (2014). *Taybetmendîy Zimanekan Wişe û riste Le Şerî Deronîda.* Hewler: (Namey Master),Koleji Ziman,Zankoy Selahedin.

Hesen, Ş. M. (2007). *Ferhengî Şiwan.* Hewlêr: Wezaretî Perwerde.

Hidsin. (1987). *Ilm Elluxe Elictmahi.* (M. E. Eyad, Trans.)

Hîmdad, M. (1982). *Elluxe u Ilim Elnefis.* Elmusil.

Hisên, R. M. (2010). *Rolî Şêwaze Komaletîyekan Le Dewlemendkirdinî Ferhengî Kurdî.* Koye: ( Namey Master), Kolêjî Ziman,Zankoy Koye.

Hisên, T. E. (2011). *Watasazi.* Hewler: Rojhelat.

Hrjar, E. Ş. (1388). *Ferhengî Henbane Borîne.* Tehran: Mctemeh Ferhengî Siroşt.

Humer, E. M. (1982). *Ilm Eldilale.* Elkwit: Mektebet Dar Elirube.

Islam, E. (1980). *Mefhum Elmena Dirase Tehliliye.* Kwit.

Iumer, M. F. (1990). Nawi Taybetyi Mirov le Zimani Kurdi. *Rosinbiri Nwe* , 112.

Kerîm, M. E. (1388). *Dîwanî Nalî.*

Klodcrman, R. R. (2006). *Watasazi.* (Y. S. Seid, Trans.) Hewler: Wezareti Perwerde.

Kohîn, C. (1986). *Bunye Elluxe Elsiriye.* (M. E. Elumeri, Trans.) Elmexrb: Dar Elbiza.

Kurdo, Q. (2013). *Rêzimana Kurdî Kurmancî û Soranî.*

Layinz, C. (1968). *Ilm Eldilale.* (M. E. Elmaste, Trans.) Besre.

Leech. *Semantics.* London: Great.

Loşin, N. A. (1990). *Ilm ldilale Dirase u Eltetbiq.* Libya,Benxazi: T,1.

Lwis, M. (1959). *Elluxefi Elmctemeh.* (T. Esan, Trans.) Msir-Elqahire.

Lyons. (1997). *Semantics.* London and Newyork: Cambirdg university.

Malik, H. (1980). Elteradif fi Elluxe. *Wezaret Elseqafiye u Elihlam,silsile Eldirasat(221* , silsile Eldirasat(221).

Maruf, E. H. (2014). *Wişey Ronan Le Zimanî Kurdîda.* Hewler: Rojhelat.

Mehwi, M. (2009). *Zanisti Hema u Wata u Watay Lekdanewekan.* Silemani: Peywend.

Mihamdîye, S. (2013). *Dewr Elsiyaq fi Tehdid Eldilale Elwezifiye.* Cezair: (Risalet Macstir),Kuliyet mihemed Xizir.

Mihemed, B. Z. (2009). *Ziman u Yasay Komelayetiyekan.* Hewler: (Namey Maser),Koleji Adab,Zankoy Selahedin.

Mihemed, D. A. (2015). *Binema u Tewerekani Watasazi Niwe.* Hewler: Hasim.

Mokiryanî, N. F. (1982). *Rêzimanî Kurdî Bu Polî yekem Beşî Zimanî Kurdî,.* Zankoy Selahedîn.

Molîne, C. (1999). *Elisiubiye.* (B. Bereke, Trans.) Eltebihe 2.

Muîn, S. R. (2005). *Wata u Dewruber.* Hewler: (Namey Master),Koeji Perwerde,Zankoy Selahedin.

Mistefa, M. F. (2011). *Jiyan u Berhemi Ziwer.* Hewler.

Nasir, M. E. (1982). *Medxel Ile Ilm Eldilale Elilsini* , 33.

Nawxoş, S. (2008). *Poxteyeki Derbari Zimanewanasi.* Hewler: kawan.

Nawxoş, S. (2010). Zimanewani. In N. Xoşnaw. Hewler: Rojhelat.

NerîmanXoşnaw. (2014). *Zimannasi Govareki Taybet be biwarekani Ziman* , 64.

Nuzerî, H. E. (2007). *Komelêk Wtar, ( Ziman Hêz Azadî )* . (M. Şasiwar, Trans.) Hewler: Minare.

Ocek, N. (2014). *Waneyen,Rezimana Kurmanci.* Kayhan Mataacilik.

Osman, Ş. (2008). *Karbûnî Ziman Le Peywendî Komalayetîyekan da.* Bexdad: ( Namey Master, Kolêjî Perwerde ( İbn Ruşid ).

Perwerde, L. L. (2013). *Ziman u Edebi Kurdi bo poli dwazdemi amadeyi.* Hewler.

perwerde, L. l. (2015). *Ziman u Edebi Kurdi bo Poli yazdemi amadeyi.* Hewler.

Qadir, S. R. (2000). *Hawbêjî û Firewateyî Le ( Gîrek ) da.* Silamanî: ( Namey Master) , Zankoy Silêmanî.

Resul, E. H. (2015). *Cend Baseki Wirdi Zimanewani Kurdi.* Hewler: Hevi.

Salih, D. E. (2014). *Roli Ziman le arastekirdini layeni deruni takda.* Silemani: (Namey Diktora),Zankoy Silemani.

Salih, P. E. (2013). *Hindê Layen Komalayetî Piragmatî.* Hewlêr: ( Namey Maste)r, Kolêj Ziman, Zankoy Selahedîn.

Sebri, E. M. (2013). In *Zimanewani Siyasi.* Hewler.

Sebrî, Ş. (2014). *Piragmatik.* Hewler: Hasim,le bilawkirawekani Ekadimi Kurdi.

Sedîq, D. F. (2011). *Le Daikbuni Wise.* Silimani: Sivan.

Seîd, Y. Ş. (2013). *Wişesazî.* Hewlêr: Hacî Haşim.

Şemis, H. E. (2006). *Şêwaz u Derbirin Le Bone Komelayetyekanda.* Koye: (Namey Master),Kolej Perwerde,Zankoy Koye.

Şemis, H. E. (2006). *Şêwaz û Derbirîn Le Bunî Komaletîyekan da.* Koye: ( Namey Master), Kolêjî Perwerde, Zankoy Koye.

Şêxanî, E. (2009). *Ferhengî Şêxan.* Dihok: Xanî.

şilîr, H. (1972). *Elmtelaibun Bliqul.* (E. Rezwan, Trans.) Kwit: Alm Elmehrife.

Şiwanî, R. (2014). *WiŞesazî Zimani Kurdi.* Kerkuk: Komelgei capxanei dawid.

Sosêr, F. D. (1998). *Elm Elluxe Elam.* (G. y. eziz, Trans.)

Şrîm, C. (1994). Elhendese Elsewtiye fi Elqeside Elmasere. *Alm Elfikr* , 118.

Tufîq, S. (1992). *Elxibre Elcemalîye.* Beîrut: Elmuesese Elcamihe Lldirasat u Elnesir u Eltewzih.

Umêd Mesudî, B. D. (2002). *Binemay Dariştin Le Mîdyakanda.* (M. Salih, Trans.) Silêmanî.

Welî, M. E. (2013). *Rageyandin.* Hewler: Rojhelat.

Weysî, X. F. (1984). *Fonetîk.* Bexdad: Eledib Elbxdadiye.

Wîdosin. (2008). *Seretayekî Bu zimanewan.* (H. Faru, Trans.) Dihok: Xanî.

Xazî, Y. (1984). *Medxe Ile Elesinel.* Dimesq: Tebhe Elule.

Xerîb, K. C. (2012). *projey ZarewayZanistî Kuurdî.* Hewler: Aras.

Xidir, N. E. (2002). Karigeri Rageyandin Leser Asti Kulturi. *Raman* , 69.

Xidr, H. H. (2010). *Taybetmendî, Morfolojîyekan, Zimanî Kurdî Le Riwangey Polênî Morfolojıyekan Zimanewanî.* Hewler: (Namey Master),Koleji Ziman,Zankoy Silahedin.

Xoşnav, N. E. (2010). *Zimannasi Govareki Taybet be Biwarekani Ziman* , 28.

Xoşnav, N. E. (2016). *Rebazekani Ziman.* Hewler: Rojhelat.

Xoşnaw, N. (2014). *Zimannasi* , 80.

Xoşnaw, N. (2012). *Rêzimanî Kurdî Kurmancî Nawerast û Kurmancî Sero.* Hewlêr: Rojhelat.

Xoşnaw, N. (2009). *Rêzimanî Kurdî Beşekanî Axawti.* Hewlêr: Minare.

Xoşnaw, Ş. H. (Hewlêr). *Tiwanay Bend le Dewlemendkirdinî Ferheng û Raperandinî Erkî Sîntaksî.* 2016: Narîn.

Xoşnaw, S. N. (2010). Zimanewani. Hewler: Rojhelat.

Yaqubî, E. (2001). Erkî Edebî Ziman Le Şîrî Kilasîkî Kurdî da. *Raman,Hejmare(57)* , 26.

Yildirm, K. (2013). *Kurmanci Lehcesi.*

yunis, M.M (2010). *Seretayek bo Zanistekani Watasazi u Piragmatik.* (N. E. Xosnaw, Trans.) Hewler: Rojhelat.

Yunis, M. M. (2007). *Elmena u Elzilal Elmena.* Dar Elmedar Elislami.

Yunis, S. T. (2013). *Sintaksî Wişe le Zimanî Kurdî da.* Hewlêr: (Namey Mastre),Koleji Ziman,Zankoy Selahedin.

Yusif, M. M. (1999). *hawler*. karkuk: rojhalat.

Zhran, B. (1981). *Islub Taha Hisîn,Zewi Eldars Elluxewi Elhedis.* Misir: Dar Elmearif.